


welat

*Lo rabe
wiha
nabe*

Faik Bulut


Rûpel 12



Sal:1 Hejmar:30 13-19 Îlon 1992 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

Kurdistan di cengê de ye

Ordiyê di operasyonên 'hundirîn' de tiştek bi dest nexist. Niha jî berê xwe daye başûrê Kurdistanê.



**Rewşa
bazarvanên
Kurd**

Rûpel 6



**Yılmaz
Güney**

Rûpel 7



**Li
Salvadorê
dema nû**
Ragıp
Zarakolu

Rûpel 4

26 hejmarên Welat

"Madem ez im ez, çima nebim ez..."

Cegerxwîn

Ez dixwazim çend gotina di derbarê 26 hejmarê welat de bibêjim. Welat, di jiyaneke nû û jiyaneke germîn de ye. Dilve, tev digere, diqîre, hawar dike; berxwe dide, zane ku berxwedan jiyaneke... Yanê dibêje: "Ez heme, ez hebûm û ezê her hebim... Wekî Seydayê Cegerxwîn dibêje: "Madem ez im ez, çima nebim ez... Madem ez im: Dîroka min jî, erdnigariya min jî, ziman, çand û edebiyata min jî, nivîskar û xwendevanên min, gerîlayên min, doza min, şer, tevger, têkoşîn, rizgarî û serbixwebûna min jî dê hebe. Çima nebe?"

Welat di hejmara yekemîn de, di manşeta xwe de: "Ji bo jiyaneke nû" û di Rojewa welêt de digot: "Ez Rojname Welat im, Ez ziman û dengê we me (...). Hûn divê li min xwedî derkevin, û min biparêzin."

Welat, rojnameyek hefteyî ye. Heta hejmare 26 an her hefte di Welat de yazdeh beş dihatin weşandin. Di Rojevê de pirsgerêkên

hefteyî dihatin şîrove kirin. Dîtin û raman dihatin diyar kirin. Nûçeyên welêt, dinivîsîne. Ji "Welat û gerdûnê me agahdar dike." Jîna civakî, dîroka me, "çand û pîşe, ziman û wêjeya me vedikole." hozan û helbestên me dide nasîn. Ji bo jinan, ji bo zarokan beşên girîng hene." Serbest, stûna wî jî, amadeyî xwendevanan e.

Heta hejmara 27 an, 490 bêjeyê nû, 26 sergotar, 34 hevpeyvîn hatîye weşandin. Nivîskarên wî yê xwedî stûn ev in:

1.A.Keskin (26 nivîs) 2.M.Anter (26 nivîs) 3.A.Durre (26 nivîs) 4.Yaşar Kaya (25 nivîs) 5.A.Tigrîs (26 nivîs).

Em rastî navên Felat Dilgeş (19 nivîs), H.Deniz (19 nivîs), Dilbixwîn (15 nivîs), M.Ali Tüysüz (12 nivîs), J. Espar (8 nivîs) tînin.

Nivîskarên Welat yê din jî ev in: E. Xemgîn, M.Xarpêtî, Ş.Cizîrî, M.Aktaş, İ.Göldaş, A.Dikili, S.Çürükçaya, A.Yiğit, Z.Aydar, Leyla Zana, Amed, H.Dicle, M.Cûmî,

M.Reşîd, G.Aslan, K.Okutan, G.Aksoy, R.Cîzre, B.Botanî, Mazhar Günbat, Nîjad Yaruk, Rûken Baxdû, Zana Farqînî, Murat Ergin, Çilkezî Keskîn, Jêhat Serheng, P.Mihoyî, Sado, Encî Egît, Yekta Welat, Ş. Arjen, Ş. Dicle, Ş.Jiyan, A.Cejn, F.Huseyn, C.Bender, Kaya Müştakhan (x)...

Gelekî xwendevanan jî nivîsarên xwe di Welat de weşandine.

Bi dîtin û ramanên min Welat gelekî gavên hêja avêtiye, xwe daye pejirandinê. Bûye pirek hêviyê. Bûye yek dest û yek dev. Welat dengê welêt e. Dengê me ye.

Pêşniyarên min: Welat divê rûpelên xwe zêde bike. Li ser ziman û dîroka xwe bi kûrahî lê vekole. Li ser edebiyata cihanî bi firehî lê hûr bibe. Jinên me zêdetir binivîsîne. Ji alî pûnto û teknîkê ve jî xwe nû bike.

"Xwendin divê hem pirr xebat Bo miletê Kurd û Welat..."

Kaya Müştakhan

FERHENGOK

Bandor: Hikarî, posîde, tesîr
Bizav: Tevger, hereket
Cerîde: Kovar, mecmua (dergi)
Çalakî: Faaliyet
Damezrawe: Muessese
Dîzik: Dêzik (güveç)
Gelş: Geleş, problem
Gerînde: (müdür)
Herîşandin: Pelçiqandin, hilweşandin (ezmek, yıkmak)
Hest: Hiş, şuûr
Karbîdest: Rêvebir (yönetici)
Kutabûn: Temam bûn
Kutakirin: qedandin, tamam kirin
Matmayî: Şaşmayî
Nepen: Veşartî (saklı, gizli)
Nependî: Nepenî (sır, gizlilik, saklılık)
Pata: Fit, wekhev (eşit)
Penaber: Muhacir (mülteci)
Penaberî: Muhacirî, iltica
Peywirdar: Wezîfedar (görevli)
Quntar: (dağ eteği)
Qût: (yem, azık, gıda)
Raborî: Derbasbûyî
Şol: Kar, iş
Tariş: Pez (Küçük baş hayvan)
Tendurustî: (sağlık)
Terîşandin: Xapandin
Tomarkirin: Tijkirin
Torî: 1)Wawik, çeçel 2) Navê çivîkeke li keviya avê dijî (su kenarında yaşayan bir kuş)
Wez: Rewş (durum)
Xûgî: Xerac (haraç)
Zanko: Zanîngêh, üniversîte, akademi



Bila Welat bibe rojane

Berî her tiştî gelek silavê şoreşgerî û evînî li we dikim. Ez bi derketina rojnameya Welat gelek kêfxweş û şanaz bûm. Em vê rojnameya xwe her tim dikirrin û dixwînîn. Êdî em dixwazin rojname, rojane derkeve.

Nema, em êdî rojnamên tirko dikirrin û dixwînîn. Emê êdî rojnamên xwe bikirrin û bixwînîn. Bi wê, emê hem zimanê xwe pêşve bibin û hem jî rastiyê bi hevalên xwe bidin hinkirin. Ka em zanibin dost û neyarên me kî ne. Kotekî û zordariya dijmin li me dike divê em binin ber çavên xwe. Tiştên ji destê me were, divê em bikin û kesên ku şiyar nebûne em wan şiyar bikin.

Em jî dixwazin mîna mirovan

li welatê xwe bijîn. Li welatê xwe kar û xebatê bikin. Ma emê çima bêne Enqerê, Stenbolê Edenê û hwd. bixebitin, ji dijmin re koletiyê bikin. Pirranî di inşaatan de dixebitin. Lê em tenê li inşaatan naxebitin. Hinek ji wan midya difiroşin, hinek gewrekan, hinek birinc difiroşin an jî seyar dixebitin. Vêca ku tu van karan bikî belediye nahêle, wê bê li texe, zilmê li te bike, hekaretê li te bike. Midyê te birêje, bixe bin piyan.

Kirinê wiha her roj berde-wam in. Êdî dinya li ser serê dijmin teng bûye, êdî nizane bê çibike.

Xortekî 16 salî
Izmir / Kadifekale

Çiçek (Türkan Alkan)

Di roja 2'ê Tebaxa 1992 an de, li Kerboranê (Dargeçit) cihê ku tu lê şehîd ketî, niha çiçek dibişkîfin.

Li ser navê malbata wê
Mendole Alkan



Sonda me Kurdistan e

Ez gelek silavan li we dikim. Ez dixwazim çend gotinan li ser Kurdistanê bibêjim.

Nêzîkî 2000 sal e ku Kurd û Kurdistan di nav Şer de ye... Me xwe gihandiye heta îro: Dijminên Welatê me pirr in. Lê dostên me hindik in. Dijminan heta îro gelek dek û dolaban li serme daye meşandin. Me bi me dane kuştin. Ma ne bes e. Heyfa me Kurdan nîn e!

Îro, roja me ye. Roj li me hilhatiye, Rêya me vebûye. Heta niha em ditirsyan, êdî îro bila dijmin bitirse. Bila ji me xof bigirin. Ey dijminên me, Tirk, Ereb û Ecem wiha dibêjin ji we re: Bizanin em kî ne lawên kê ne. Em Gotî ne, Medî ne Kaldî ne, Urartî ne, Marî ne, bizanin bapîrên me kî ne. Kiyaksar e, Nemrud e, Erdeşîr e, Ebûl Mûslim Xoresanî ye. Selhedîne Eyûbî ye, Şêx Seîd e, Seyît Rîza ye, Qadî Mihemed e..

Rêya me û sonda me, bizanin ku Kurdistan e.

Akif Karakoç / Almanya

Zewaca bi zorê (bang)

Gelî hevalan, ez xortekî 18 salî me û li Kurdistanê bakur li bajarê Batmanê rûdinê. Ez jî, wekî gelek mirovên Kurd, ji zû ve li hêviya rojnameyek weka Welat bûm. Ji bo pêşveçûn, azadî û serxwebûna gelê Kurd û Kurdistan, Welat barekî giran daye ser milên xwe. Ez bi hêvî me ku rojnameya Welat, wê vî barî hetanî ku gelê Kurd bigihîje azadiyê karibe hilgire. Gelî hevalên hêja, derketina rojnameya Welat ez gelekî kêfxweş kirim û em spasdar in ji we re.

Gelî hevalan ez zanim hûnê bêjin heya niha ev di ku de bû? Lê baweriya we bi xwedê be, ez vê nivîsarê bi saya Welat dinivîsim. Heke di nivîsara min de piçekî kêmasî hebe jî, ez divim hûnê li qusûra min nenêrin. Divê ez niqstayekê ji we re bêjim. Gelî hevalan li Batmanê taxa (tara) ku ez lê

rûdinê, beriya bi 2 rojan di devê tara me de rûşeyek mezin çêbû. Xwişkêka me ya 12 salî diviyabû têkeve nava şerê serxwebûn û azadiyê. Birayekî wê jî, beriya bi 2 sala ketibû nav şer û bûbû gerîla. Ev xwişka me şeva ku biçê bavê wê, wê zefî kir û wê bi darê zorê dizewicînin. Ê ku wê dizewicîne û alkariyê bi bavê wê re dike mele ye. Ev mele jî beriya niha di nav gel de welatparêz dihate nasîn. Navê wî jî mele Birhan e. Ez dixwazim hûn vê nivîsarê di Welat de biweşînin, ji bo gel pê bihise û naletê li însanê wiha binin, da ku careka din tiştek wiha çênebin.

Gelî hevalan, ez li dawiya nameya xwe de gelek silavên şoreşgerî li we dikim û herdem di nav kêfxweşiyê de bin. Gelek spas

Ji Batmanê
Xwendevanek

Pîreka şehîd Zerdest, Zêrîn:

'Xwezî ne ji van zarokên hûr bûya'

Xwişka Zêrîn, jiyana û rewşa xwe bi kurtî ji kerema xwe re hûn karin binin ziman?

-Ez li gundekî Kurdistanê li navçeya Nisêbinê rûdînim. Min bixwe şes zarok hene, pênc keç û lawek. Hinek zeviyên min hene ez zarokên xwe bi wî awayî xwedî dikim. Beriya ku Zerdest şehîd bikeve û di nava têkoşina neteweyî de cih bistîne rewşa malbata me rind bû. Di hêla aborî de tu asteng ji me re tune bûn. Piştî ku Zerdest ji malê cuda bû û di nava têkoşinê de cih stand, xwedîkirina zarokên min kotektir bû, lewra îro ez ne karê hundirî tenê dikim, ez ji bo jiyaneke bi rûmet û serfiraz zarokên xwe amade dikim, da ku ew ji bibin layiqê doz û rêça bavê xwe.

Zerdest çend salan di nava têkoşina neteweyî de cih stand?

-Kekê min, Zerdest di sala 1987 an de hate girtin. Piştî ku hate berdan dest bi têkoşina şerê çekdarî kir. Di sala 1991 an de li herêma Mêrdînê, li Nisêbinê, di meha Gulanê de bû şehîdê Kurdistanê.

Şehîdîbûna Zerdest çî tesîrê li te kir, tu poşmanî te dît?

-Birayê min, ev çî gotin e, ezê çawa poşman bibim, bi vê yekê ez kêfxweş dibim, tesîr çawa li min bû, ez ji te re binim ziman. Ez di welatparêziyê de zehfîr zexim bûm.

Ji malbata te kesên ku di nava têkoşina neteweyî de cih girtine hene?

-Di nava şerê çekdarî de 4 pismamê min û keçek apê min şehîd ketin, îro jî birayê min û pismamêkî min hê jî di nava şerê çekdarî de li serê çiyayê Kurdistanê şerê azadiyê didin.


Xwişka Zêrîn, îro rewşa jin û keçê Kurd çawa ye bi te, bi serhildana şerê neteweyî tesîr û guhertinek li ser jin û keçên Kurd afêriye an na, îro di çî rewşê de ne?

-Keko rast e, îro ne ez tenê dibêjim, cihan tev zane, jin û keçên Kurd bi kincê neteweyî bi kesk û sor û zer xwe xemilandine. Ala berxwedanê ji destê xwe nadeynin, li destê û çiya li gund û bajaran bilind û bilind dikin. Ala xwe tim û tim di serhildanan de, bi sloganên bijî Apo, li pêş in. Ez dibêjim, heke bav û lawê Kurd weke jin

û keça, li pêş bûna, emê zûtir ji koletî û bindestiyê derbasî serkeftinê bibûna.

Kekê min ma berya şerê çekdarî qey rewş, soz û qirar ji jin û keçan re hebû? Na. Îro bi şerê têkoşina neteweyî jin û keçên Kurd di refên pêş de, bûne xwedî rûmet, bûne pêşvan û rêzan. Bi têkoşina şerê çekdarî, ne rewşa jin û keçên Kurd tenê guheriye, rewşa hemû Kurdistan hatiye guhartin. Kurdistan roj bi roj ber bi serkeftinê we diçe.


Hevpeyvîn: Ş. Arjen



Zêrîn, bi zarokên xwe re...

Jiyana şehîd Hogir

Hogir ji navçeya Nisêbinê li gundê Zorava radiwestîya. Malbata Hogir di herêmê de malbateke zehf fireh e, ji wan re dibêjin malbata Qaso. Ev malbat di herêmê de bi welatparêziya xwe ji hêla gel ve tê nasîn. Di çavê dewletê de jî terorîst e.



Hogir

Hogir di sala 11 an de ji dibistanê qerîya, paşê li gund, jiyana xwe domand. Ji kar û xebatê nedireviya û qet jî, tirs lê peyda nedibû, zehf jîr û jêhatî bû. Li gund, çiqas kar û şixul têteta hêla wî dikir, bi hetanî şivantî, rênçberî û cotkariyê. Bi gundiye xwe re gelekî alîkar û bi tifaq bû.

Hogir ku 20 salê xwe dagirt, çû leşkeriya Dewleta Tirk, 4 meh leşkerî kir, piştê jî bo 15 rojan bi îzin vergeriya malê. Di van 4 mehê leşkeriyê de kîna wî li hemberî Artêşa Tirk zêdetir bû. Lewra çiqas kotekî û hovîtî hebû bi çavên xwe dît.

Hogir digot: Serê min jî, jê bibe, stuyê min jî, li ber kindir be, ez ji Artêşa

Tirk re nema dibim leşker.

Hogir di van 15 rojan de bi endamê têkoşina şerê neteweyî re kete têkiliyê û di nava Eniya Nete-weya Rizgariya Kurdistan de cih stand. Hogir bi hevala xwe keça Kurd Zinarîn ve li herêma Mêrdîn, li gundê Bikêrê rêxistinên xwe berfireh dikirin. Sala 91 ê di meha 9 an de bi berekek xayin û qeleş bi destê sîxurê dewleta Tirk, Hogir û hevala wî Zinarîn hatin qetilkirin.

Cendekê Hogir di birêkê de hate dîtîn. Cendekê wî, ji hêla bi hezaran kesên welatparêz ve, bi lîlan û halan, li goristana gundê Zarova hate defnkirin. Hogir li herêma ku lê têkoşin dikir, pirr dihate hezkirin.

HAWAR

Dilbixwîn

Şirnex dişewite; diçin Enqerê

Na na! Êdî kesek nikare bibêje çima hûn ji nîvserokên başûr re dibêjin xayîn in. Êdî mafê kesekî nîne di vê mijarê de wan biparêze.

Dîsa dibêjim, kî dixeyide bila rojekê berê bixeyide, ezê bibêjim, rastiya li holê divê were ziman. Kincên ku wan laşên xwe di binî de veşartine divê were çirandin, ma wê heya kengî bi me bikenin? Wê heya kengî li ser piştê me siwar bibin û biçin deriyên dijminan bikutin? Wê heya kengî ziman dîrêjiyan bikin?

Êdî bes e! Hestî kêrê hilnagire. Heya niha we xwe li ser xwîna pêşmergeyên başûr kire "Serok", lê ji niha û şûn ve, na! Ez dizanin mafê we çî ye, li benda pêşerojê bin.

Ez dipirsim; agir bi Şirnexê dikeve 15-20 hezar mirov ji pêçekên yek rojî

heya kalên 90 salî bi çalê ketine, girî, şîr hawar û hahoya wan esman hilanî. Dirama û trajedyayek li Şirnexê ye, eger xîret û hisyet hebe wê mirov xwedî lê derkeve, wê mirov bibêje; heya ku dengê min heye tol û heyf! Xayînen me. Belê, xayîn in, gotin hişk û tûj e, lê rast e, rastî jî divê were gotin.

Diçin Enqereya bavo. Çi li Enqereyê heye? Qirkirina ku çêbûyî li Şirnexê ye, şerê ku çêbûyê ne li Enqereyê ye. Kurdên ku xaniyên wan bi ser wan de hilweşiyan e, Kurdên Şirnexê ne...

Êdî em dibihîsin û dibînin, em ne Kurdên destpêka çerxa bîstan in. Bawer bikin dijmin wan ji xwe re weke navgînên şerê taybetî bi kar dihêne. Hefsar xistiye stuyê wan û ji wan re dibêjin zû bibêjin; "PKK terorîst e, Apo Îddî Emîn e, em destûre nadin wan ji başûr êrîşî dewleta bavo bikin..." Kurê Berzanî jî ku nizane du gotinan bibêje, nivîsa dewletê, ji rojnamevanan re dixwîne û dibêje: Apo Îddî Emîn e. Sebîr gihişte dawîya sînorê xwe, êdî nema em dibêjin; mezinên me ne ew in, ji me baştir dizanin, ew bibêjin çî, emê bibêjin ha...!

Na keko na! Rewş hatiye guhertin, karwanê serxwebûn û azadiyê bi rê ketiye, serokatî peyda bûye. Partî damezirîye, roja zêferê xwe dixemilîne û hêdî hêdî tîye der.

Hûn mirov bêgav dikin ku bibêje hûn hevxebatkar in, çima? Dihok milkê bavê we ye? Hûn bi çî zagonê nahêlîn em di nava xwişk, bira, dê û bavên xwe yên Zaxoyî, Dihokî û Hewlêrî de bigerin û derd û kulên xwe ji hev re şîrove bikin?

Hûn çima nahêlin stranên Koma Berxwedan û strana "Apo heta Hilwanê", bi serbestî were gotin, li hemberê hûn qasetên İbrahim Tatlıses belav dikin, di radyo û TV. ya xwe de derdixin û reklama wî dikin? Hûn çima nahêlin pirtûkên Serokê 30 mîlyon însan werin xwendin û belavkirin. Berxwedan û Serxwebûn, Dengê Kurdistan, qedexa ne, çima? Çima weşanên MÎT ê serbest û eşkere ne? Ma em nizanin. Eger mirov koka we bikole dibe malbata we (Berzanî) ne Kurd be jî. Li gorî Melle Evdulrehaman û mamosta Osman Sebrî pratîka we vê yekê îspat dike. Hûn neyar û dijminê Kurdan in. Ne tenê bi dev, bi karê xwe jî îspat bikin ku hûn Kurd in. Êdî em li hêla hêlan guhdarî nakin, mêjiyê me ketiya çavê me, em baş dizanin bibînin. Ji lew re hûn nema dikarin me, bi PKK terorîst e û Apo Îddî Emîn e, bi-xapînin. Herin, herin ji xwe re hûn û dewleta "bavo" bi hev bikenin. Lê; ji bîr nekin ku PKK dest daye ser hêlîna we!

Li Salvador demajoya partiya legal destpêkir



Gerîlayên FMLNê piştî şerekî dirêj û sefiraz derbasî jiyana legal bûn.

Ragîp Zarakolu

Li Salvador peyman aştîyê, ya di nav gerîla û hikûmetê de, hate îmzekirin û tevî hin gelemşeyan derbasî jiyana dibe. Encama vê, ya herî girîng jî, ji 10'ê Tirmeh'a 1992 an vir de, legalbûna FMLN (Farabundo Martí Eniya Rizgariya Neteveyî) ku ji çend rêxistinên gerîlayan avabûye ye. Ev qanûn, tevî dijberiya partiyên rast, bi giraniya Serok Cristianî ji meclîsê derbas bû. Bi

vê awayê jî, pirsgerêkên peymanê kevin berteref bûn. Di 13 ê Hezîranê de serok Cristianî û serokên rêxistinên FMLN, li ser bernameyek nû li hev kirin.

Di parlamentoya Salvadorê de, partiyên rast, ji bo sabotekirina peymanê, qanûnek ji parlamentoyê derbas kiribûn. Li gor vê qanûnê dê mehafîzên neteweyî (Guardia Nacional) û polisên bejîk (Policia) de Hacienda li gund û navçeyan kar dikirin) ku li girtiyan û li xelkê

îşkençe dikirin karê xwe bidomînin. FMLN jî, li hember vê qanûnê ji %20 hêzên xwe, ku divê heta yekê Gulanê belav bikirana, wek xwe hişt û belav nekir. Bi van pêşveçûnan peyman ku hatibû kirin, ji holê rabûbû. Dawî, bi biryara serok Cristianî, ev herdu hêzên polîsan ên taybetî hatin belavkirin. FMLN jî 1600 gerîlayên xwe bê çek kir û ev gerîla derbasî jiyana legal bûn. Heta 31 ê meha Cotmehê, dê hemû hêzên gerîla çekên xwe deynin.

Wekî din, tabura Bracamento a taybetî, ku li balefirgeha navneteweyî kar dikirin jî, hate belavkirin. Ev tabûr, bi xûgi (xerac) ya ku ji rêwiyan distandin deng dabû.

Mangayên mirinê jî, livbaziyan xwe gelek hindik kirine. Lê tişteki balkêş derketiye holê, niha ev mange dest bi kuştina serserî û dizan kirine. Herhal naxwazin pratîka xwe ya mirovkuştinê winda bikin.

Di vê navê de, kuştina sendîkavan Nazario Garcia û bombekirina buroyek navenda nûçeyan ku nêzî FMLN weşan dikirin, ji bîr nekirin.

Li Salvador, pirsgerêka herî girîng reforma erd bû, ev pirsgerêk bi peymanê çareser bû û kete jiyana. Gundî li benda madeyên peymanê yên ku bi demajoyê ve hatine girêdan in. Carna jî erdan îşxal dikin û hem jî livbaziyan li dardixin.

Gerîlayên ku li 15 navedan hatine civandin, ji bê tevgerî û negihîştina alikariyê gazinan dikin.

Di encamê de, hêzên gerîla û hikûmet, piştî şerekî ji 10 salan zêdetir pata derketin, yek nikaribû zora yê din bibê. Bi daxwaza li hev hatin û aştîyê ku ji xelkê dihat, peymanek ku li dinyayê mînakên wî gelek hindik in, hate îmzekirin. Hê jî, li kuçeyên payîtexta Salvadorê alîgirên FMLN, xwepêşandanên bi çûş li dar dixin û qumandarên kevin, ji bo hilbijartina 1994 an amadekariyên xwe didomînin. Di rewşa îro de "siyaseta aştîyê" bi pirranî bi kêrî gerîlayan hatiye.

'Amerîka di hundir de wêran dibe'

Yekda Welat

Li ser navê hinek zanîngehên Amerîka ji bo projên civakî û psîkolojî em hatibûn vexwendin. Ji 20'ê Tebaxê heta 7'ê Îlonê em li gelek bajarên Amerîka geriyay. Em bi rewşenbîrên zanîngehên Amerîka re rûniştin û li Amerîka geriyay, da ku li ser civak, kom û pirsên gel rawestin. Herwiha me rûniştinek bi gelên Amerîka yê xwediyê welatê Amerîka ên rastî, bi Îndiyanan re çêkir.

Di vê nivîsandinê de em naxwazin li ser wan projan rawestin. Em dixwazin hinek dîtînen xwe li ser gelê Amerîka yê Îndiyan bi rêz bikin.

Bi ger û dîtina Amerîka, ji aliyê C.Kolumbus di sala 1492 an de, rêçeke nû ji kedxwariyê re, hovîtî û qirkirina gelan re hate vekirin. Dewletên Ewropayê bi her babetên xwe Amerîka Bakur û Başûr xistin bin destê xwe. Îro jî, gelên Amerîka yê rast nemane, an jî roleke wan a pêwîst di welatê wan de nemaye. Lewra ev sala 1992 an jî, pîrozbahîya 500 salîya dîtina Amerîka ye û nişaneke imperyalîzmê ye, ku kedxwarî, bêmafî û qirkirina gelan diyar dike.

Em li Amerîka; sê rojan bûn mêvanê koma Îndiyanan bi navê xwe Semîno. Koma Semîno di sedsala 18. an de pîrr berxwedan li dijî leşkerê Dewletên Yekbûyî yê Amerîka (DYA) kiribûn. Lê mixabin wek komên Îndiyanên din, bin ketin. Ji wê demê ve koma Semîno kirine nav 'Resevation'. DYA cihek da ye vê komê ku tenê karibin di wê derê de bijîn. Ev cih bi xaka xwe ne pîrr dewlemend e. Mirovên Îndiyan nikarin kar bikin û malbatên wan her dem birçî ne. Ji ber ku karibin xwe xwedî bikin gundê xwe kirine muze ji bo tarîstan. Gundê xwe bi her tiştên xwe ango zarok û zêç, jin û mîr, kal û pîr, sewal (hey-

wan), xênî û hwd. ji tarîstan re vekirîye. Dema em li wê derê bûn hinek turist ji Detroit li wî gundî digeriyan. Ev turist wek barbar û nemirov bi wan Îndiyanan dikeniyay. Diketînan nav malên wan, wêneyên cihê rake-tina wan dikişandin. Me ji yekî ji Detroit pîrs kir, çima wiha bê rûmet li wî gundî digerin. Bersiva me wiha da: "Tenê Îndiyanekî mirî, Îndiyanekî baş e (Gotîneke, ku dema qirkirina Îndiyanan di çerxa (sedsala) 15 an heta 19 an dihat gotin)."

Berpîrsiyarê wî gundî miroveki 76 salî ye, bi xwe Îndiyan e û herwiha jî rûsîpiyê wî gundî ye. Wexta li ser dîroka Îndiyanan, çiya, mîrg, newal û çemên şîn diaxivî çavên wî geş û dilê wî xweş dibû. Herdem ev kale-pîr li ser welatê xwe yê azad, bê Ewropiyan diaxivî. Kalêpîr wiha diaxivî: Em, Îndiyan, di cihanê de xwedî dîrokeke pîrr kevin û giranbuha ne. Lê îro welatê me di bin destê mirovê sipî (Ewropî) de ye. Mêtîngehiya me ne wek mêtîngehiya dewletê dinê, wek Hindê û hinek dewletên Afrîka ye. Bi zordarî welatê me ji me standine û me qirkirine. Îro sê Îndiyan nemane û bi rastî jî em tunebûne."

Di wan sê rojan de me lihev-rûniştin bi pîrr mirovan re çêkir û me jî, gelê Kurd û Kurdistan bi wan da naskirin. Bi naskirina Kurdan pîrr kêfxweş bûn û nêzîkbûneke hevaltî di nav me û Îndiyanan de çêbû.


J. Donald, navê wî yê rastî Şahîne Reş, ji koma Sioux e, wiha ji me re got: "Em di dîroka xwe de, tene digihîştin ku li dijî hovîtîya Ewropayê derkevin. Berxwedana me, ya eşîran bû. Yekîti û nîştîmanperwerî ya welat bi tevayî tunebû. Me her kes jî bo herêma (erdîma) xwe û eşîra xwe şer dikir."

Dem a ku em, bi Şahîne Reş re li ser rewşa Kurdistanê rawestiyay, wî wiha dom kir: "Ku

gelê Kurd ji bo welatê xwe, îro, niha şer neke, berxwedan neke, wê bibê weke me. Em, Îndiyan di welatê xwe de, bûne wek sewalên (heywan) di bexçan (bustan) de, ku bi peran (dirav) ji her aliyên cihanê tînan li me mîze dikin."

Dawiya gera me, miroveki rûsîpi jî koma Hopî gihîşte me û demekê bi me re geriya. Koma Hopî bawer in ku heft demê cihanê hene û ev dem dema pêncan e. Ji dema pêncan heta şeşan pîrr xirabî, bê mafî, kedxwarî û gemarî hene. Serokê wan tiştan, serokê dewletên kedxwarin (imperyalîzm) û wê di dema şeşan de tev tune bibin.

Li ser rewşa Amerîka ew rûsîpi wiha axivî: "Li çek, teknik û hêza Amerîka mîze mekin. Li hundirê Amerîka binêrin, tev vala ye, bê çand e. Îro Amerîka bûye Mc. Donalds, Coca Cola... Îro gelê Amerîka li ser peran, Disney World û Hollywoodê diaxive û pê meşqûl e. Hikûmeta Amerîka, xewnan ji gelê xwe re çêdike, dixwaze ku gel şiyar nebe. Ev nerastî û derew hêdi hêdi derdikevin holê. Amerîka ji derve de çiqas mezin xuya be jî, ne rast e... werin li nav Amerîka binêrin. Tişteki hêja tê de-nîne, tev plastîk û naylon e. Amerîka nexweş e, pîrr nexweş e... Amerîka di hundir de, wêran dibe."



Sazûmana rizîyayî, tenê xwe bi notîrvanan dikare biparêze. Lewre serf qûç e, binî pûç e!

Mafên mirovan li Tirkiye



Zêdehî (mabalexe) nîne ger bêjim; kême dewlet he ne ku bi qasî dewleta Tirkiyê behsa mafên mirovan û demokratîyê bike.

Kesê dîroka çêbûna vê dewletê nizanibe, ji dût ve jî lê binêre dikare fen û fêten wê hîn bibe.

Telebanî û Berzanî ewa demeke ku Enqere kirine qonax û bingeha xwe û dewleta Tirk jî dewletek demokratîk dibînin. Bizava nîştimanperweriya Kurdistanê ya li bakurê Kurdistanê ya bi rêberiya PKK ê terorîst dibînin.

Tiştê dewleta Tirk bi xwe dibêje, cihê daxê û şermê ye. Ev hemû karê ne di rê de, ji layê van mîrên bê xulam ve, bi navê Kurdaiyê di bin polîtîk û dîplomasiya hevçerx de tê kirin. Nimûnên hovîtî û karên nemirovahîye ku, Tirkan ji hatina xwe ya rojhilata navîn heta niha di derheqê milletê Kurd û Kurdistanê de kirine pîr in.

Niha dixwazim bi kurtî behsa rewşa penaberên Kurd bikim. Ên di payîza sala 1988 an de di bihara sala 1991 ê de ji zilm û hovîtîya rejîma Bexdayê reviyane û naçar xwe avêtine bextê rejîma Enqerê.

Kesê ku ji nêzik agahdarî rewşa van penabera be, ji roja pêşî heta niha, hingê wê baş bizanibe. Ku ew

derdeserî û azarên van penabera bi çavên xwe dîtî û dibînin. Li ber destê karbidestên dewleta Tirkiye. Penaberan hind azad bi çavên xwe nedîtiye, li tu cihekî, ji bilî penaberên Kurd, li Îraqê, Îranê û Sûriyê.

Carê, ji bilî hindê ev penaberên ku li ser axa welatê xwe, bûne penaberê ber destê dijminên xwe. Helbet ev ji aliyê saykolocîve (nefsî) pîr azar e. Lêdan û girtin, paşvebirin û axaftinên nexweş û bi zor û zilmê derê xistina penaberan jî bo ber destê rejîma Îraqê ya faşîst bigre heta berî du salan dewleta Tirkiye penaberên bê guneh ên Kurd li kampê Mêrdînê jehir dikirin.

Wê baştir be, eger ez deqê nameya penaberên Kurd ên li kampa Mêrdînê, berî çend rojan ji bo komîta me, komîta Swêdî û Kurd a li bajarê Falköping, ji bo alîkariya penaberên Kurd ên li kampên Tirkiyê ne, şandibûn, bexim ber çavên xwendevanan. Hingê bi başî, demokratî û mirovayetiya dewleta Tirkiyê de xuya bibe.

Ev e, nameya penaberên Kurd

Hevalên heja we pirsyara wezê (rewş) me û xelkê kampê kiribû. Rastî bête gotin mawekî (demekî) mecalê me xweş bû. Xelkê bi destê xwe şol dikir û

çavên wan lê bû, rizqekî peyda bikin. Dema vegerin Kurdistanê (mebest başûrê Kurdistanê) bixwin. Belê bedaxewe carekî din rejîma Tirk dest avête tevnê xwe yê cara û eve mawey 10 (deh) rojane nahêlê yek kes ji kampê derkeve û dest bi kutana pêşmergan kirine. Pêşmergeyek şehîd kirin bi navê xwe Ehmadi Hekîm Rovînî û dudiyar jî birîndar kirin bi navê xwe Usmet Reşîd Birîfkî û Reşîd Temer Koçer in. Heta vê saeta nameyê dinivîsim, şeş pêşmerge jî girtî ne û di zîndanê de ne.

Nêzikî 300 kes ji kampa me bi zorî birine Îraqê. Bi kurtî, wezê (rewşa) me ne xweş e.

Belê, dewleta Tirk di mafên mirovahî û dîmokratîyê de wiha ye. Ev dewlet, berî her tiştî nêzikî mirovayetiya û dîmokratîyê nabe. Wek Kurd dibêjin: "kîtîk û qutîk, leglege û xwaringeh, hirç û gêre."

Belê aferîn, sed aferîn ji bo kesên ku xwe serokên Kurdan dizanin û bi pasportên Tirkiyê, di ser kampên penaberên Kurdan re difirin, diçin bo paytextên Ewropa, Amerîka û Tirkiyê.

Do parçeyê rojhilat bû, îro parçeyê başûr e sibehi dora parçeyê bakur e. Erê ma heta kengê?

Abdulwahid Bavi

Weqfa azadî û mafên kurdî

Serokê heyeta rêveberiya weqfê, Şerafettin Elçi, di heftê mehê de li bajarê Stenbolê li "tabibler odası" bi civînekê avakirina weqfê diyar kir.

Şerafettin Elçi, sebebê avakirina weqfê wiha diyar dike. "Me nexwest em li nember tahde û kirinên dewletê bêdeng bimînin. Ji ber vê yekê, me Weqfa Maf û Azadiyên Kurdî ava kir. Heke dewlet riyên demokratîk li ber me bigire û bixitimîne, wê gavê ji bo lêgerîna mafên Kurdî, hin riyê din jî bo me meşrû dibin."

Beriya avakirina vê weqfê, Navenda Çanda Mezopotamya jî, xwestûbû weqfa Çanda Kurdî damezirîne, lê dewlet destûr ne dabû.

Vêca Şerafettin Elçi dibêje ku dewlet destûre nede emê bi riyên din li mafên xwe bigerin. Bivê nevwê hinek pîrs di serê mirov de çêdibin.

Gelo dê kîjan rê ji bo Şerafettin Elçi û hevalên wî meşrû bibin?

Kesên ku di heyeta Rêveberiyê de cih distînin jî ev in: Şerafettin Elçi, M. Ali Eren, Hasan Deniz, Ibrahim Aksoy, M. Emin Kardeş, Refik Karakoç, Remzi Çakın, Ali Beyköylü, Yılmaz Çamlıbel, Mehmet Parlak û Cemal Özçelik.


CHP ji nû ve vebû

Partiyên ku bi biryara cuntaya 12 ê îlonê hatibûn girtin, piştî 12 salan, ji nû ve vebûn. Vebûna van partiyan bi xwe re hin gelemşeyan jî anîn. Lewra, endamên van partiyan, her yek di partiyek nû de cihê xwe girtibûn. Vebûna CHP ê, ji partiyên din bêhtir tewlihevî çêkir. Wekê tê zanîn, ji bo Ecevit, tevî partiya xwe DSP derbasî CHP ê bibe, gelek daxwaz hatin kirin. Lê Ecevit, biryarek wiha li dijî prensîbên xwe dît û li hember sekinî. Inönü jî, CHP ê ji bo çareserkirina pîrsgirêkên SHP ê wek xocê xizir dît û hêviya xwe pê ve girê da. Lê xortê sipehî Deniz Baykal hêviya Inönü di dil de hişt û xuya ye ku demajoya jiholêrabûna SHP ê dest pê kir.

Deniz Baykal û Erol Tuncer ji bo serokatiya CHP ê li hember hev rabûn. Baykal di hilbijartina yekemîn de zora Tuncer bir. Lê diyare ku di rastiyê de piştî Inönü danî erdê.

Girtî di bin darê zorê de ne

Di girtîgeha Elezîzê de li girtîyan zilm tê kirin. Ji girtîyan re rojname, kovar û pirtûk hatine qedexekirin. Di operloyan de marşên nijadperest didine guhdarîkirin û tiştên xwarin û vexwarinê yê ku ji derve tên, peywirdarê girtîgehê dest datînin ser û nadin girtîyan, Li ser van kotekiyan girtî, sê roj ketin greva birçibûnê. Roja sisêyan gerîmendê (midûrê) girtîgehê mafên girtîyan ên xwezayî pejirand. Piştî çendekê ev problem dise dest pê kir. Li gor ku girtî dibêjin, tevliheviyên mezin herdu alîkarê midûr (Ismail Aksoy, Kazım Kaya) derdixin. Ev herdu kes ji berê de endamên MHP'yên xedar bûn. Ev herdu kesên paşverû dixwazin hemû peywirdarên girtîgehê bixin bin bandora xwe. Girtîyên girtîgeha Elezîzê dibêjin ku ev pîrsgirêk neyê çareserkirin emê zanibin çawa li mafên xwe yê xwezayî bipirsîn.



Deniz Baykal

Hevpeyvîn bi karkerên bazarvan re

'Mafstandin bi yekîtî dibe'

Bila tu kes nebêje çawa ezê li welatê xwe xwedî derkevim? Lewre di hemû deveran de mirov dikare tiştêkî ji welatê xwe re bike. Gava ez li gundek Şirnexê nêzikê tixûbê Iraqê leşker bûm. Di şevên tarî de, min telîsek, tijî nan dikir û dibir dida hevalan.

Bi alikariya hevalekî, em dikevin rê û diçin bazarê ji bo hevpeyvînekê bi karkerên bazarvan re bikin. Heval çend bazarvanan (bazarcî) nas dike. Hê em neketin wê bazara mezin û bê dawî; em dengê bilind ên bazarvanan dibihîsin. Lê heta niha, me ewçend bala xwe nedayê; dengên ji bazarê bilind dibin zehfê wan bi Kurdî ne. Cure cure, textît textît bi devokên Kurdî deng tên. Zehfê wan bi Kurdî bi hev re dipeyivin. Ji te kirî (Tu dibêjî qey) tu li nava bazareke Kurdistanê yî û yê hawîrdora te jî, tev de Kurd in. Lê, ev bazar ne bazara Kurdan e û ne jî li bajarek Kurdistanê ye. Li navenda paytexta Tîrkiye, li Enqerê ye.

Belê, em hêdî hêdî dimeşin û li dora xwe dinêrin. Bazarker bi hev re bi Kurdî dipeyivin û bi kirryaran (muşteriyar) re jî bi tirkî dipeyivin. Em nêzikahiyê li hevalê ku emê pê re bipeyivin dikin û ew jî, ji dût ve me dibîne û bi dengê bilind dibêje: "Ka werin, kerem bikin, hûn bi xêr hatin, ser sera û ser çawa hatin." Piştî ku hevalê min dibêje "Ev heval ji Rojnâmeya Welat e" û min dide naskirin, hevalê bazarvanê kêfxweş dibe, û dibêje: "Hûn bi xêr û sed şahiyar hatine. Êdî ez dibînim rojnâmeyên me jî he ne û rojnâmevanên me tên bi me re dipeyivin, guhdariya derd û kulên me dikin. Ma di dinyayê de dixweşiyek, şahiyek jî vê yekê xweştir heye?"

Bi vî awayî me dest avêt axaftinê.


-Bi kerema xwe, tu dikarî xwe bi xwendevanên me bidî naskirin?

-Navê min Enwer e. Malbata me beriya sed salan ji Botan çûne Erzeromê û ji wê derê jî, beriya 50-60 salan e ku me koç kiriye Enqerê. Wekî ku dibîni em niha li vê derê ne û li bazaran sebze, hêşînatîyê û tişt û miştên din difiroşin.


-Gelo, karê we ji aliyê aborî ve çawa ye, hûn dikarin jîna xwe bi vî karî bidomînin?

-Bi kurtî emê halê xwe bêjin; havîn û demên biharê bi vî karî idara me dibe. Lê zivistanê ne wekî havînê ye. A rastî zivistanê têra me nake. Wekî din, tu dibîni karê me zehf zehmet e, zor e. Tu dawîya vî karî tune. Ne sîgorta me heye, ne jî tu garantiyên me. Divê em ji binî nexweş nekevin. Divê em her roj bixebitin. Ji xwe, tatila me jî qet tune. Em her roj çardeh-pazdeh saetan dixebitin. Lê tiştê ku em heq dikin jî, nastînin.

-Danûstandinên we bi kirryaran (muşteriyar) re çawa ye, bi taybetî jî, bi kirryarên Tirk re?



Gel im ez/ Bi hilkan nayem hejmartin/ Di dengê min de/ Hêzek heye, pir bedew/ Ji bo di tariyê de bejin bavêje/ Hêşin bibe. (Pablo Neruda)



Îro, pîraniya lêkîlîroş û bazarvanên metropolê Kurd in. Wek karker û gundiyên Kurd, ew jî, ji vê jlyanê ne memnûn in, lê ji bo karbin bijîn, vî karî dikin.



Têkoşîna neteweyî fesîra xwe li hemû Kurdan dilke. Ne tenê li Kurdên Kurdistanê dijîn, li yê derve jî. Bazarvanên metropolê jî daxwaza yekîtiya neteweyî lijin ziman.

-Gelek ji wan dema ku tên bazarê û dibînin em bi hev re bi Kurdî dipeyivin, naxwazin danûstandinê bi me re bikin. Lê, mecbûr dibin. Lewre, ji % 70 bazar di destê Kurdan de ne û mecbûr dibin tiştan ji me bikirrin.

-Ez lê dinêrim ku kurdiya we zehf delal e û hûn bi hev re jî bi Kurdî dipeyivin. Gelo ev rewşa ha ji kengê ve dom dike, an jî, we ji kengê ve dest avêtiyê?

-Birayê min, beriya 6-7 salan me nikaribû bi Kurdî xeber bida. A rastî ne ku me nikaribû, lê em li ser nedisekinin. Zehfan ji me bi tirkî dipeyivin. Lê îro, wekî ku tu dibîni ew rewşa kambax ji binî ve hatiye guhartin. Ji %95 bi hev re Kurdî dipeyivin. Ez zanim tuyê ji min bipirsî "gelo çawa ev rewş hat guhartin?" Ezê ji birayê xwe re bêjim: Ev rewşa ha bi saya PKK'ê hat guhartin. Ne ku tenê ev rewşa ha, lê gelek rewşên din jî bi vî awayî hatin guhartin. Bala xwe bidîyê, pêşiya çend salan dema yek ji partiyê di hate kuştin, bavê min digot "oxxweş, va terorîstek hate kuştin." Lê îro dema yekê kuştin, bavê min ê 65 salî digrî, wekî zarokan li ser şervanan digrî. Wekî din pêşiya çend salan em nikaribûn bi azadî di van bazaran de kirrîn û firotinê bikin. Em rojekê dihatin yek nedihat. Piştî ku em bi xwe hesiyar me xwe nas kir, em rabûn û li hev civiyar. Me got; êdî emê alikariya hev bikin. Tiştêkî bi serê kesekî bê, ên din bila alikariya wî bikin. Û wekî me got jî, me kir. Tu dibîni niha ji %70 zêdetir jî bazar, di destê me de ne. Tu kes nikare devê xwe ji me re xwar bike.

Lewre em hemû yek in. Di komela bazarkeran de jî em bi quwet in. Îro li vir, nêzikê 1000-2000 Kurd ên ji Erzeromê hatine, di bazaran de dixebitin.

-Gelo navbera we û polîsan, zabitan çawa ye, hûn li hev dikin an na?

-Bi serê te kim, em û polîs wekî av û agir in, wekî şev û rojê ne. Ango em ewçend jî hev dût in. Û em li hev nakin. Tu dizanî li bazaran gelek şer, li hevdayîn çêdibin. Qet tunebe rojê şerek-dudu çêdibin. Polîs tên me dibin qereqolê. Lê mixabin li wê derê Kurdî-tirkî jî hev kifş dibe. Zilamê Tirk ji 24 saetan pê ve li qereqolê namîne. Lê dema dor digêhe me rewşê guhartin. Gelek caran me heft-heşt rojan dihêlin di qereqolê de. Gelek caran jî, îşkence li me dikin. Tiştê bê fêmkirin ev e; ji binî wekhevî tune. Lê em çî bikin? Em mecbûr in jîna xwe bi vî karî bidomînin.

Hûn jî xwendevanên welat re dixwazin çî bêjin?

-Ez dixwazim yek tiştêkî tenê, lê zehf girîng bêjim: Geli hevalno li welatê xwe xwedî derkevin. Lê bila tu kes nebêje çawa ez ê li welatê xwe xwedî derkevim? Lewre di hemû deveran de mirov dikare tiştêkî ji welatê xwe re bike. Ji min ders bigrin; ez di nav ordiya Tirk de li gundek Şirnexê nêzikê tixûbê Iraqê leşker bûm. Di şevên tarî de, piştî nivê şevê, min telîsek tijî nan dikir û dibir dida hevalan. Vê car hûn dibînin mirov dikare di hemû deveran de tiştêkî ji welatê xwe re bike.

Hevpeyvîn: Gafar Erbek

Neşîk



Di rîya heqiyê de mirina ji bo gel,
mirina herî bi rûmet e.

Yılmaz Güney



Y I L M A Z G Ü N E Y

Yılmaz Güney. Nivîskar û sinemagerê Kurd. Bi rastî, malê herkesî, lê bi rastîya xwe bê xwedî. Lewre ew, di serê her kesekî de, bi awayek çih girtiye, her yek li gorî xwe Yılmaz Güneyek afrandiye. Li gorî sinemagerê hemdemê xwe wî, ji bo sinemaya Tirk, xizmetên bê hempa pêk aniye û ew, di nav sinemagerên hemdem de, di rêza pêşemîn de ye. Ji bo vî beşî, Kurdên, an sosyalîstbûna wî ne girîng e, ev aliyên wî neyên nîrxandin jî dibe. Li gorî hin jinên ku ketine jiyana wî, lumpen, berdûş, mîrekî çê û perestê çeka xwe ye. Ew bi mîraniya xwe û bi çeka xwe bawer e. Ji jinan gelek hez dike, carna jî, ku teqlê wî li hev dikevin, li wan dide, belê ev lédan jî, ji hezkirinê tê, çî dibe bila bibe, zane li ber dilê jinan bigere. Di dilê gel de, sembola mîranî, durustî û xelasiyê ye. Wilo dihat bawerkirin ku, dê rojekî Yılmaz, rahiştaya çeka xwe û wan ji feqîrî û

bindestiyê xelas bikiraya. Literatura wan jî guhartî bû, wan peyvên xwe ji filimên wî, ji gotûbêjên wî yê argo digirtin. Gelek ji wan dikaribûn, ji bo Yılmaz Güney bimirin jî. Ji bo cure cure sosyalîstan, Yılmaz Güney jî, bi awayên cure cure di hate nîrxandin. Hinek ji wan, wî sosyalîst, hinek jî, xayîndiditîn. Xayînbûna Yılmaz, ji bo desthelatdaran ne tişteki veşarî bû. Ew bi filim, nivîs û kirinên xwe, ji bo dewletê talûke bû û diviyabû ku, bi îşkence û zindanan bê xelatîkirin.

Werhasil, Yılmaz Güneyek bi tenê tune ye. Ji bo her beş û kategoriye Yılmaz Güneyek heye û ew bi Yılmaz Güneyê xwe qayil in.

Yılmaz Güneyê karikaturîstê heja Xelîl Ziravav jî, wek li jor jî tê ditîn, bi reşê xwe tariya dirokê, bi spiyê xwe jî, ronahiya pêşerojê ye. Di awirên wî yê dijwar de, dostaniyek germ û dilsoziyek xurt heye.

TÎR



Musa Anter

Aqil û mantiq

Weleh ez ji bo xwe şaş dibim, ku îsal 80 sale ez li vî welatî (çawa) dîn nebûme.

Dibêjin, rojekê Şahê Ecem di xewna xwe de dîtiye ku wê baranek bê û heçî ji wê avê vexwe, wê dîn bibe. Şah ji xew radibe, çî bibîne, deşt û zozan tijî av bûye. Êdî îmkana Şah nemaye ku ji mîletê xwe gişa re bêje. Li seraya xwe tembîh dike ku wê avê venexwin. Rojek du roj derbas dibin, mîlet giş ji wê avê vedîxwîn û dîn dibin. Lê ehlê serayê, ji ber ku ji wê avê venexwaribûn, weke berê bi aqil mabûn.

Lê, dê çawa bi mîlyonan xelk, xwe dîn û çend ehlê serayê bi aqil qebûl bikin? Xelk li dora serayê bûne kom û gotin: Şahê me û dora xwe giş dîn bûne.

Şah fikirî, ku nikare rastiye bi evqas mirovî bide zanîn.

Got: De ka ji wê avê bidin me jî. Av dane wan û ew jî dîn bûn, bûne weke hev û li hev kirin.

Ez dinêrim, îsal 80 sal in, bê aqiliya ku min kiriye, min ji ava Tirkiyê venexwariye. Ev Pêncî û pênc sal in ku ez ji Tirkan re dibêjim hûn dîn in, dewleta Tirk jî, ji min re dibêje; tu zir dîn î.

Navê vî mîrikî meşhûr Mehmet Ali Birand e. Xwediyê "32. Gün" e. Ev 32, hejmareke tewş e. Çima ne sih e an jî yek din e? Maneya wê heye birakno. Di terîqeta bê dîn û îman Masonan de, ku em Kurd ji wan re dibên Farmason, rutba herî mezin 32 ye,

De ka, kes nizane bezê guhê bavê wî ji ku ye, hinek dibêjin Tatar e û hin jî, li çav û rengê wî dinêrin, dibêjin; ji barbarê Efrîqa ye. Lê ez yeqîn dikim, ku Xwedê ev zilam, ji bo nav Şerqê wek bela şandiye. Navê vî mîrikî meşhûr Mehmet Ali Birand e. Xwediyê "32. Gün" e. Ev 32, hejmareke tewş e. Çima ne sih e an jî yek din e? Maneya wê heye birakno. Di terîqeta bê dîn û îman Masonan de, ku em Kurd ji wan re dibên Farmason, rutba herî mezin 32 ye, Yanî wiha tê, xuya ye ku haşayê navê Muhamed, Mehmet Ali Birand, Masonê herî mezin e. Di alema îslamê de, ji wan re dibêjin: "Meşîrîqê Azam." Wezîfa Meşîrîqê Azam jî, ew e ku fitne û fesadiyê têxe nav mîletê musulman.

Ma ku ne wiha bûna, wê çawa deriyên serokên dinyayê gişka li ber vekiribûna. Ev mîrik, di 1988 an de, li gundê min Stîlîlê, hate ba min jî. Wê çaxê, min fêhm kir ku ew zilam, çalik ji me Kurdan re dikole. Ez dinêrim îro jî, mîrik rima xwe daye ber singa Kurdan. Lê ez nizanim kê puf kiriye qûna wî. Ji temamê Kurdên dinyayê re bûye dirî û ketiye ser rîya me. Çiqas tişteki pîs û xayîn hebe dibêje û dinivîse. Ne hewceye ku em pîrs û hereketê wî gişkan binivîsîn. Lê hema tiştên ku di 7.9.1992 an de nivîsiye bes e. Min divê ez gotinên wî pêşî bi tirkî binivîsim: "Yani başımızdaki Yugoslavyadan başlayarak tüm dünyayı saran etnik bölünme süreci yaşanırken, Kıbrısta zorla tek devlet ilkesinin sürdürülmesindeki mantıksızlık gösterilmelidir." Yañî, ku em gotina wî bi kurdî bêjin, mîrik dibêje; ma wê: çaxê kes dikare mîletekê bi xwe ve girêbide. De an henek, an rast dibêje. Lê ez dinêrim di temamê nivîsandin û xebirdanên xwe de, bê aqiliyeke mezin dike, ji ber ku Kurdan nabîne, an jî hinekî din çavê wî girê didin.

Li Qıbrısê, ji 50 hezar Tirk re, dewletê heq dibîne, lê li Şerqa Navîn, ji 30 mîlyon Kurd re, dewletê heq nabîne, heqên însanî û demokrasî jî zêde dibîne.

Ma Mehmet Ali Birand! Xwelî li serê Kurdan be, ku bi xêra te bin. Hema mineta te jî, li serê çiyê!

Çapemeniya navneteweyî hikûmeta Tirk protesto kir

Kuştin û birîndarkirina roj-namevanan; qedexekirin û komkirina rojname, kovar û pirtûkan; li hember van kirin, gotin û beyanatên çewt ên berpirsiyarên dewleta Tirk, bala hemû rojnamevanên dinyayê kişande ser Tirkîyê. Êdî rêxistinên çapemeniyê yê navneteweyî, ji daxuyaniyên dewleta Tirk bawer nakin û bi zimanekî dijwar van kuştin û qedexekirina, protesto dikin. Tevî hemû astengiyên ku rêvebirên dewletê ji roj-namevanan re derdixistin, dîsa jî nûçevanên (muxabîrên) ku li Kurdistanê dijîn û hejmarek rojnamevanên Ewropî lêkolînên xwe domandin û li ser rewşa Kurdistanê û Tirkîyê, agahdariyên pirr girîng bi dest xistin.

Piştî van lêkolînan hate famkirin û pê derxistin ku li Tirkîyê hêzên dewletê, zilm û zordariyê li ser gel û roj-namevanên Kurdistanê dimeşin û serbestiya çapemeniyê ji holê rakirine. Li gor agahdariyên ku rêxistinên çapemeniyê yê navneteweyî bi dest xistine, rojnamevanên li dû rastiye digerin û xeberên rast dinivîsin, bi alîkariya hêzên dewletê an tene kuştin an jî, ji aliyê Dewletê ve, rê li ber wan tê girtin.

Ji ber van sebebên, hemû rêxistin û komelên çapemeniyê yê internasyonal, gili û rexneyên xwe li hember dewleta Tirk diyar dikin.

Bi banga rêxistina navneteweyî ya azadiya danûstandina ramanê (IFEX), 9'ê Îlonê wek roja protestokirinê, hate îlankirin. Êrişên ku li

Tirkîyê, li hember roj-namevanan tene pekanîn, di 9'ê Îlonê de li gelek bajarên Ewropayê, ji aliyê rêxistinên navneteweyî ve hatin protestokirin.

Li gor wan rêxistinên, li Tirkîyê serbestî û mafên roj-namevanan, ji destên wan hatiye standin.

Serokê Enstîtûya Çapemeniya Navneteweyî, (IPI) Cushrow Irant û direktorê vê sazgehê Peter Galliner, li Enqerê di civîneke çapemeniyê de, rêvebirên Dewleta Tirk rexne kirin û xemgîniya xwe ji bo rewşa roj-namevanên Tirkîyê anî ziman.

Lushrow Iranî wiha axivî: "Ê ku dibêjin rojnamevanên tene kuştin terorîst in, divê dikaribin vê îdiayê îspat bikin.

Ku ev bi temami neyê îspatkirin, em wan îdiayan qebûl nakin û ji wan bawer jî nakin."

Li aliyê din berpirsiyarê Komîteya Parastina Endamên Çapemeniyê Yê Ewropa û Sovyeta berê, Andreç Yurkovskî jî, ji ber rewşa roj-namevanên Tirkîyê, rêvebirên Tirk rexne kir û wiha peyivî: "Berpirsiyarê van qetliaman, ku ne dewlet be jî, li gor çavdêriyên me, em têgihîştin ku dewlet ji bo van qetliaman dengê xwe dernaxe û rê li wan nagire.

Daxwaza hemû rexistinên çapemeniyê yê navneteweyî, ji berpirsiyarên Dewleta Tirk ev e ku, rojek beriya rojekê rewşa rojnamevanan bê başkirin û qanûnên ku serbestiya çapemeniyê sinor dikin, bèn hilanîn.

Kurdistan di cengê de ye

Hefteya çûyî, Artêşa Tirk bi quweteke pirr mezin û bi çekên xwe yê herî giran dest bi operasyonan kir. Ev operasyonên pirralî bi dizî dest pê kirin. Artêşa Tirk ji aliyê ve bi balefir û firokan çiyayê Cudî û dora wî dan ber bombeyan, ji aliyê din ve jî, bi navê taqîpkirina gerîla ya germ, derbasî Kurdistanê Başûr bû û di ber de jî, gundên nezîkê sinor, dîsa bi bombeyan xera kirin, û şewitandin. Herdu rojên pêşî, rojnameyên burjuwa qet behsa van operasyon û qetliaman nekirin. Ev, listik û taktikeke nû bû. Ji Newroza îsal ta 15'ê Tebaxê, dema Artêşa Tirk dest bi operasyonê dikir çapemenî, bîyî operasyonê an jî bi destpêka operasyonê re, pesnê Artêşa Tirk dida, destê xwe jê re li hev dixist û bi vî awayî dixwest çavê gel bitirsîne.

Ev car, çapemenî di destpêkê de qet dengê xwe dernexist, ji ber dixwest haya kesî ji qetliaman çenebe.

Dema çapemenî dît ku Artêşa Tirk ev car jî serfiraz nebû û çavê gel di bédengiyê de jî natirse, dîsa dest bi qirvîrê kir. Û roja sêyemîn, bi dorfirehî dest bi derewan kir, pesnê artêşê da. Hinek rojnameyan, wêneyên gerîlayên kuştî yê kevn ên di arşîva xwe di rûpelê xwe yê pêşî de weşandin, hinek nivîskarên quncikan jî di gotarên xwe de li ser serfiraziya Artêşa Tirk sekinîn û nivîsandin ku bi sedan gerîla di van operasyonan

de hatine kuştin.

Lê bi rastî di dema operasyonan de yek rojnamevanê wan bi tenê jî, bi Kurdistanê neketibû û nûçeyên xwe bi temami bi derewan diafrandin. Li aliyê din muxabîrên me yê li Kurdistanê dijîn ji me re-nûçe şandin ku Artêşa Tirk di van operasyonan de derbên pirr giran xwarine û vê hêrsa xwe di serê gundiyan destvala de, derdixê û wan qetil dike.

Bi kurtî, ev taktîka dewletê ya nû jî, dîsa bi kêrî tu tiştî nehat û hêviya çapemeniyê neanî ch.

Li gor nûçeyên muxabîrên me yê Kurdistanê, van rojên dawî dîsa hejmara leşkerên Tirk li Kurdistanê zêde dibin. Ji ber vê yekê jî, dibe ku di rojên pêşiya me de Artêşa Tirk dest bi operasyonên nû bike. Radyoya BBC jî ev nûçe teyîf kir. Li gor agahdariyên gihîştine destê me, her roj bi hezaran leşkerên nû, bi sedan wesîteyên leşkerî ji aliyê rojava ber bi Kurdistanê ve diçin.



Rapora Şirnexê ya heyeta ronakbîr û hunermendan

'Şer ji çiyar daketiye bajarên'

Li Stenbolê, ji bo bûyera (qetliema) Şirnexê, di cih de bibînin û li ser lêkolîn bikin, heyetek ji ronakbîr û hunermendan Tirk û Kurdan (Doç. Haluk Gerger, Sungur Sarvan, Bilgesu Erenus, Ahmet Kahraman, Eşber Yağmurdereli, Cezmi Ersöz, İbrahim Gürbüz, Ayşe Zarako-

lu, Eren Keskin, Aydın Ertan, Imam Şahin, Ali Beyköylü, û Recep Maraşlı) hatibû damezirandin. Ev heyet, li Kurdistanê, bi taybetî jî, li Şirnexê geriyar û lêkolîn kirin. Heyet ji 1'ê Îlonê heta 3 yê Îlonê li herêmê ma. Heyet di 5 ê Îlonê de di avahiya Komela Rojnamevanên Hemdem de

civînek çêkir. Dîtin û lêkolînên xwe bi raporekî ji raya giştî re pêşkêş kirin.

Di civîne 'de Doç. Haluk Gerger, Sungur Savran, Bilgesu Erenus li ser rewşa Şirnexê peyivîn. Piştî peyivîna rapora ku amade kiribûn, xwendin. Di raporê de rewşa Şirnexê wiha dihat zimên: "Bi rastî, dewlet nexwest bi me re rûnê ûli me guhdarî bike. Lê em li Şirnexê geriyar û baş me fêhm kir ku li me dewlet li vira qetliamek kiriye.

Me li Şirnexê tu delîlek ne dît ku em karibin bêjin PKK êriş ser Şirnexê kiriye. Piştî êrişa dewletê, tîm û leşker dikin û malan tev talan kirine, şewitandine û heywanan kuştine. Ger di qetliama Şirnexê de zêde kes nemiribe, sedema wî jî ev e; ku, gel ketibû sitargeh û bodroman.

Bi rastî, herçiqas îro hejmarê wan hindik be jî, hinek ronakbîr û hunermendan Tirk, li dijî vî şerê qirêjî, ku dewlet dike, disekin. Û nîşan didin ku di vî şerî de cihê ronakbîr û hunermendan li ba gelê Kurd û têkoşîna wî yê bi maf e...

Çapemenî, 'Baba' û Baykal

Komara Tirkîyê, ji destpêka avabûna xwe hata îro hebûna xwe bi metodên leşkerî û bi xapandina gel domandiye. Çapemeniya Tirk jî, tu car destek û piştigiriya xwe ji rêvebirên dewletê qut nekiriye. Herdem eyb û kêmasiyên dewletê û hovîtiyên artêşa wê veşartîye. Ev hefte sal in çapemenî bûye wek berdevkê dewletê û gelên Anatolê dixapîne. Çapemeniya Tirk tiştê dewlet dixwaze, dinivîse; tiştê ku ne bi dilê dewletê ye, nanivîse û xwe jê re kerr dike. Bi vî awayî, herdem bala raya giştî dikşîne ser pirsên ku bi kêrî gel nayên. Dema qetliamek li Kurdistanê çêdibe an jî greveke karkeran li Tirkîyê diqewime, ji bo bala gel bikşîne aliyekî din û gel rastiye nebîne, behsa tiştêkî bê qîmet dike û di-

ke manşet. Ji bo gel şiyar nebe, carna hemû rojnameyên burjuwa, dikarin deh roj li ser hev, jiyana Semra Özal, konsereke Michael Jackson binivîsin an jî xebereke beredayî bikin sermanşet.

Armanca vê çapemeniyê, tenê parastina dewleta sermayedar e. Ji bo vê armancê carna serê wezîr û serokwezîrên dewletê jî dikare bixwe. Ta doh jî çapemeniya Tirk, Demirel derdixiste asîmanan. Lê îro ku, Demirel nema dikare bi peyvên "demokrasî" û "gundî û memûrên min" gel bixapîne û rewşa dewletê ber bi xerabiyê ve diçe, çapemenî jî ketiye pey listikên nû; ji bo xelasiya dewletê dixwaze serê Demirel bixwe. Bes, fedakirina Demirel ne bes e, divê yekî din têxin şûna wî. Ew jî De-

niz Baykal e. Niha hemû nivîskarên quncikên rojnameyan mîna Sabah, Hürriyet, Cumhuriyet û hwd Deniz Baykal derdixin pêş. Nivîskarên ku Demirel wek xelasker û 'Baba' didan naskirin, îro dev jê berdidin û Deniz Baykal diparêzin, wî wek horiyê demokrasiyê pêşkêşî raya giştî dikin.

Çiqas cara ku, rewşa Dewleta Tirk ketiye tehlûkê û dijwar bûye vê çapemeniya derewker, bi mebesta veşartina pîrgirêkên bîngêhîn, serokwezîrek ji çav derxistine û yekî din wek xelasker pêşkêş kirine. Ev, metodeke wê ya kevn e û heta îro gelên Anatolê pê xapiyaye û bi kêfî zordestiya refên serdest hatiye.

Bes, îro gel guheriye, bi milyonan karker, gundî û xwendekar bi listikên van dijminên xwe hisiyane. Ji ber vê yekê xapandina gel êdî wisa ne hêsan e. Ev gel nema bi serîxwarina serokwezîrekî bixape.

Li her alî livbaziye gerîla

Şerê gel bi firehî geş dibe. Dewlet vê heftiya çûyî, dîsa çiyayên Kurdistanê, da ber bombeyan. Piştî rapêrînên 15ê Tebaxê, dewlet dixwest ku bi operasyoneke mezin û giştî bi ser gerîla ve here û hêzên gerîla belav bike. Bi vê serfiraziye jî demoralizasyona xwe çareser bike. Ji ber vê yekê, hêzên dewletê di 4'ê İlonê de bi 30 hezar leşker, tanq, top û bi balefirên xwe ve, dest bi operasyonek mezin kir. Ji çiyayê Agirî bigirin heta Cûdî û Kurdistanê Başûr dan berxwe û êrişî ser qampên gerîla kirin. Bi rastî nêzikî gerîla jî nebûn, lê çî derdiket ber wan, bombebaran dikirin, gund, çiya dehl û newal... Li aliyê din gerîla jî ranewestiya û êrişên xwe yê dijwar domand. Gava operasyonên dewletê dom dikirin, bi êrişeke mezin bi ser qereqola Alan de girtin û qereqolê bi tevî leşkerên tê de imha kirin. Ji Erziromê bigrin heta Farqînê gerîla rê li ber xayin û leşkeran girt, ereban sekinand û trênan şewitandin. Ev heftiya çûyî jî, şer bi firehî li her aliyê Kurdistanê geş bû. Careke din nişan da ku wê her dem operasyonên dewletê bi berxwedan û êrişên gerîla bê sekinandin.

Bi rastî, bi zor û zehmet be jî, dê berxwedana gel û şerê gerîla dom bike. Vê heftiya çûyî jî, bûyerên ku nûçeyên



wan gihîştine me ev in:

4 İlon: Hêzên dewletê di 4'ê İlonê de dest bi operasyoneke mezin kirin. Operasyon ji çiyayê Cûdî destpêkir, û heta çiyayên Gebar, Herekol, Agirî û Tendurek belav bû. Dewlet bi 30 hezar leşker, tanq, top û bi balefirên xwe ve êrişî ser van çiyayan kir. Di çiyayê Agirî de, di nav hêzên dewletê û gerîla de şerê mezin çêbû, dewlet hejmarek zêde leşker kişand ser çiyayê Agirî. Di vî şerî de, teymenek, asteymenek û 6 leşker hatin kuştin astsu-

wan gihîştine me ev in: bayek û 3 cerdevan jî birîndar bûn.

Li nehiya Farqînê li Sêdeqne (Bayrampaşa), di nav hêzên dewletê û gerîla de şer çêbû. 11 leşker hatin kuştin. Dewlet di dawiya şer de, gund bombebaran kir, 20 gundî qetî kir.

Gerîla avête ser navça Çelîkhanê bi roketavêjan xesar da qonaxa hikûmetê û avahiya qeymaqamiyê.

Li İzmîrê xayinek bi navê xwe Celal Bayık ji aliyê ERNK'ê ve hate kuştin.

5 İlon: Şerê di çiyayên Herkol û Tendurekê de, ku di 4'ê İlonê de dest pê kiribû hê jî domdike û îro 30 leşkerên ku dixwestin gora gerilayekî vedin, bi teqandina mayînekî birîndar bûn.

Gerîla riya navbera Bîngolê û Gencê girt, 7 xayin kuştin, yek jî birîndar kirin û 2 kes jî bi xwe re birin.

6 İlon: Gerîla li Dîgorê avête ser qereqoleke ser sînor. 2 gullêyê roketavêjê îsabetî qereqolê kirin, kûştî û birîndar nehatin, tespît kirin.

7 İlon: Li Diyarbekîrê taxa Mergahmedê çend kes bombe avêtin û gulle reşandin qilûba polîsan û beqçiyek birîndar kirin.

Li sûka Bismilê dikana xayînekî ku bi navê xwe Feyzî Öncel e hat şewitandin.

Li Cizîrê gerîla 3 cerdevan revandin.

Li Nisêbinê polîsek hat kuştin.

Li Erziromê, nêzikî navça Şenkaya, li Zozanê Baldiz, di nav hêzên dewletê û gerîla de şerê mezin derket. Li gor kesêrî ku vê bûyerê ditine dibêjin gelek leşker hatine kûştin.

8 İlon: Gerîla, di navbera Erzirom û Erzîngonê de êrişî ser stasyona (rawestîngeh) Geçîtê kir. Trêna Rojhilatê (Doğu Ekspresi) sekinandin, nasnameyên rêwîyan qontrol kirin. Serleşkerê qereqola jendermeyan ya Kemahê Orhan Güler kuştin, leşkerêkî birîndar jî dil girtin. Piştî propagandayê lojmanên vala, trêne û stasyonê şewitandin. Dawî bi leşkerê ku hatibûn hawara stasyonê re şer kirin. Astsubayek kuştin 5 leşker birîndar kirin. Dîsa di vê saetê de gerîla riya di navbera Erzirom û Sêwasê girt. Nêzikî 250 erebe sekinandin propaganda kirin û 2 qemyon şewitandin.

Êvarê jî riya Tercanê girtin erebe sekinandin. Ji otobêsekê leşkerêkî dil girtin û otobêsekê şewitandin.

Gerîla di navbera Diyarbekîr û Farqînê de li nêzikî gundê Aslo rê girt. 5 Hizb-î Kontra bi xwe re birin.

Li Çelê konvoyeke leşkeran ket kemîna gerîla, gelek leşker hatin kuştin şofêrê minibusek mir û 7 leşker jî birîndar bûn.

Li Erxenê li gundê Kartuklu, di nav gerîla û cerdevanan de, şer çêbû. Cerdevanek hat kuştin 2 jî birîndar bûn.

10 İlon:

Li Qilaban (Uludere), gerîla êrişî ser qereqola jenderman kir. Gelek leşker kuştin 3 jî, revandin.

Li Sêrtê, li gundê Kûtnis, di nav hêzên dewletê û gerîla de şer derket. Serbazek (Astsubay) û leşkerêkî hatin kuştin.

Li Agiriyê, di navbera Bazîd (Dogubeyazîd) û İxdirê de, li nêzikî gundê Gewro, muxbîr Abdurahman Akkuş ji alî gerîla ve hat kuştin. Û wî, di devê wî de pere, bi dîrekekî ve dalgandin.

Amerîka û li rojhilata navîn lîstikên nû

Rojhilata Navîn, bi lîstikên Amerîka, li benda pêşerojêke tarî û xwînrijîyêke dijwar e. Di dest de girtina kontrola petrola Rojhilata Navîn, di nav welatên Împeryalîst û neteweyên herêmê de, dibe sedemê gelemşeyên mezin.

Nîjad Yaruk

Piştî şerê xelîçê, Amerîka ji bo bicihkirina hêzên xwe yê dagirker, bi hinceta (bahneya) alîkariya hin neteweyên bindest, herêmê tevlihev kir. İro jî, li Başûrê Iraqê ji bo, ji çaxistina Sedam, bi destê şîyan digire. Hinceta Amerîka yê ji bo alîkariya (!) şîyan, êrişên Sedam in. Li gor daxuyaniyên İnanê, hêzên leşkerî yê Iraqê, bi ser gundên şîyan ve

digirin û şîyan qir dikin.

Amerîka jî, li ser vê daxuyaniya İnanê, bi biryara Neteweyên Yekbûyî (NY) Başûrê Iraqê, yê ji paralela 32 an wir ve, ji balefirên Iraqê re qedexa kir. Iraq heta îro jî, ji vî tixûbê ku Amerîka daniye, derbas nebûye.

Weke tê zanîn, Iraq li Bakur jî, ji paralela 36 an wir ve nikare bilive. Amerîka, ji bo kontrolkirina Bakur, Hêza çalak, li Bakur û Başûrê Kurdistanê bi cih kiri-

ye.

Rojhilata Navîn, bi lîstikên Amerîka, li benda pêşerojêke tarî û xwînrijîyêke dijwar e. Di dest de girtina kontrola petrola Rojhilata Navîn, di nav welatên Împeryalîst û neteweyên herêmê de, dibe sedemê gelemşeyên mezin. Amerîka jî xwe re hinceteke mezin zêft kiriye. Ew jî, daxistina Sedam e. Lê bi rastî armanc ne ev e. Ger Sedam, li dijî berjewendiyên (menfeatên) Amerîka derneketa, tu problem di nav wî û Amerîka de dernediket. Belê Sedam tiliya xwe xist qula mozê û ji bo Împeryalîstan bû talûke. Sedam di hemû kirinên xwe yê de, desteka van welatên Împeryalîst distand

û bi çekên wan, gel qir dikir. Helebçe dîrokeke dûr nîne.

Wan bombeyên ku Helebçe hilweşand, di fabrikayên van welatan de hatibûn çekirin. Li hemû dinyayê, di gelek welatan de, bi milyonan gel, bi van çekan hatine kuştin, an jî, jar bûne.

İro Amerîka, ji bo gelên Rojhilata Navîn li gor nîzama dinyayê ye nû, ya ku li gor berjewendiyên xwe afirandiyê bi rêz bike, herroj lîstîkeke nû diafirine. Kurdistanê Başûr û şîyên Başûrê Iraqê jî, ji bo meşandina vê bernameyê (programê) bûne navend. Rola Sedam, di vê bernameyê de, wek ya figuranekî jî, nîne.

PÊNÛS



Amed Tigris

Ev çawa Kurdperwerî ye, çi polîtîka û dîplomasî ye?

Serokên du hêzên Başûr ên mezin Mesûd Berzanî û Celal Telabanî riya Enqerê kirine riya kaniyê. Her ku tên Enqerê, bi waliyê Diyarbekirê, serok û pisporê MÎTê re rûdin. Buroyên xwe li Enqerê vekirin. Roj bi roj pêwendiyên (têkiliyên) xwe bi Tirkîyê re, hin jî zêde pêşve birin. Vê carê bi Wezîrê derve, Serokwezîr û di dawî de jî, bi Serokkomar Turgut Özal re civîn çêkirin. Serokên Başûr, niha jî mirovên wan her ku bi Tirkan re dadinişin (rûdin), mijar PKK ye, ku çawa bi hevdu re karibin derbe li PKK'ê bixin an jî, wê ji navê rabikin. Serokên Kurdên Başûr piştî her civînê, vê armanca xwe bi awayekî vekirî tînin zimên. Di vî warî de preskonferansan çêdikin. Di van preskonferansan de dostaniya xwe û dewleta

Tirk, demokrasiya dewleta Tirk, parastina yekîtiya Tirkîyê tînin ziman. Bi berpirsiyarên dewleta Tirk re, hemû stembarî, barbarî, zordarî û diktatoriye dikin stûyê PKK ê. PKK bi pêwendiyên rejîma Saddam re sêrdar dikin. Ev polîtîka gundîrî û eşirtiyê êdî 50-60 sal li paş ma. Ji ber ku mirov tîkiliyên xwe û Enqerê tiştekî normal nîşan bide, divê mirov dêzik çêbike û çembilan (helboq) jî pê vebixe. Dêzik bê çembil nabe.

Ev polîtîka gundîrî û eşirtiyê êdî 50-60 sal li paş ma. Ji ber ku mirov tîkiliyên xwe û Enqerê tiştekî normal nîşan bide, divê mirov dêzik çêbike û çembilan (helboq) jî pê vebixe. Dêzik bê çembil nabe.

Wek xwendevanên me yên ku bi tirkî dizanin, di mijara tîkiliyên PKK û Saddam de di rojnama Yeni Ülke hejmar 34 an de qomûtanê Kampa Haftanîn wiha bersiv dida:

-Tîkiliyên me û Saddam, propaganda şerê taybetî ye, ku dewleta Tirk li pey me dike. Îtîra ye. Em çawa diçin bi qatîlê gelê Kurd ê Helebçê re pêwendî datînin. Pêwendî bi Saddam re, karê serokên Kurdên Başûr e...

Di hejmara 36 ê Yeni Ülke de dîsa bi Apo re hevpeyvînek heye. Di vê hevpeyvîne de jî vê pîrsa han ji Apo dikin. Apo dibêje ku:

-Ez pîr vekirî dibêjim, tu pêwendiyên me û Saddam bi hevdu re çênebûne. Ev bi temamî propaganda Tirkîyê û Amerîka ne. Baş dizanin çi tîkilî di navbera Tirkîyê û Saddam de hene û çêbûne. Tirkîyê û Amerîka ji bo ku îtibara PKK ê bişkinin vê propagandayê avêtine navê. PKK li ser prensîban pêwendî datîne. Di prensîbên me de dizîbûn, nependî tune. Vekirî ye. Eşkere ye...

Radyoya Tirkî Merhaba li Swêdê, di 6 ê vê mehê de li ser Kurdan programekê çêkir. Berpirsiyarê Yekîtiya Nîştîman Abdurrezak Fehîlî ji spîker re wiha, digot:

-Esas hûn nizanin PKK çawa belav dibe. Em bi vê yekê baş dizanin. Divê hûn hemû grûbên Kurdan ên derî PKK bikin yek û ji wan re îmkanan çêbikin û wan bibine welêt. Heqê ziman û kulturî bidine wan. Wan li welêt biparêzin. Wê demê PKK namîne...

Hefteya borî Mesûd Berzanî li Enqerê, hin jî sewiya axaftina xwe daxist û pê dan gotin ku "Apo ne Kurd e." Ev gotin ne a Mesûd Berzanî ye, ya nîjadperestên Tirkan e. Ew bûn çend sal in ku propaganda dikin "Apo ne Kurd e, Ermenî ye."

Tiştê ku mirov pê matmayî dimîne ne sînorê Kurdayetiya Berzanî û Telabanî ye, ya ew grûb û kesên Bakur ên ji derî PKK ne. Gelo nivîskarên Kurd ên li derî welat ku di hinek nivîsên xwe de 25mm. ji axa Kurdistanê kêr nakin û ji hinekan re şûrê xwe dikşînin, lê, ji van re pênûsa xwe nakşînin? Ew kesên polîtîk ên ku ji ber zilm û zordariya dewleta Tirk revî û niha li der dijîn, çima bersiva Berzanî û Telabanî nadin? Gelo ev kes û grûb êdî jî îro şûn ve li ser axa Bakur polîtîkayê nakin? An jî di destûrên wan de bi tenê rexnegirtin li PKK û pesndayîna Başûr heye?

Ziman nîşana neteweyî ye!

Borzoo S.D.

Welatparêzên me yên hêja heval Abdullah Keskin û Fezat Dilgeş, di rojnâmeya Welat hejmar 23 an de, gilî dikin ku Kurdên me li zimanê xwe xwedî dernakevin û naxwazin zimanê xwe pêşve bibin.

Piştî silavên şoreşgerî û welatparêzî ji bo hemû hevalên zehmetkêş yên berpirsiyarên rojnâmeya Welat, ez jî dixwazim çend gotinan di vê barê de bêjim.

Welatparêzên hêja û dilsoz! Wek hûn jî dizanin, bilî Kurdên Kurdistana Bakur, hejmareke pîr jî, kurdên ji sê beşên din ên Kurdistanê li derveyî Welat hene. Hinek ji me gelek sal in ku li van welatên Ewropî û bi pirranî li Almanayê dijîn. Di van salan de, me di pîr komelên xwendevanên Kurdistanê de cih girtiye û di gel komelên karkeran, kar û xebat kiriye.

Yek ji problem û dijwariyên me yên herî mezin, mesela ziman e. Em Kurdên ji sê beşên Rojhilat, Başûr û Başûrê-Rojava li hemû kêr û kurtiyên xwe di xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî de, rexnan li xwe dikin, lê di axaftina rojane de em zor (pîr) qîmet û hurmetê didine zimanê xwe yê zikmakî. Em dikarin bêjin ku em hemû bi serbilindî û serfirazî bi kurdî diaxivin. Lê mixabin pîrriyaniya mirovên me yên Kurdistana Bakur zêde qîmet û hurmetê ji bo zimanê kurdî nagirin. Ev yek me pîr pejmurde û xemgîn dike. Me pîr caran li ser girîngiya ziman di dîrok û jiyana gelan de û herwiha li ser rola ziman di hebûn û parastina gelan, di tunekirina wan de gotûbêj kiriye. Lê ev gotin tu tesîrê nakin. Ji bo axaftina zimanê tirkî em pîr caran jî, ji hev eşiyane û hinek ji

xebatê dîr ketine. Lê em dîrketina ji xebatê rast nabînin. Em careke din gazi li wan hevalên ku bi kurdî dizanin û hurmetê ji bo zimanê xwe nagirin û tirkî diaxivin, dikin, ku dest ji vê yekê berdin, ji ber ku ev yek, yekîtiya me sist dike û dibe sebeb ku, em ji hev dîr kevin an jî, nikarin baş bi hev re bimeşin.

DIJMIN DIXWAZE ME BÊ ZIMAN BIHÊLE

Em dizanin ku dijminê xwînxwar û rejîma Tirk a Kemalîst di 70 salên derbasbûyî (raborî) de, çi aniye serê gelê me. Em dizanin ku pîr mirovên me hene, ku bişiftîne (asîmîle bûne) û bi kurdî nizanin. Em ji van hevalan naxeyidin ger ew bi tirkî biaxivin jî. Em nikarin wan mirovan fêhm bikin ku kevirê welatparêziyê li sîngê xwe dixin, bi kurdî dizanin, lê bi tirkî diaxivin. Ma gelo ew nizanin ku dijmin di vî 70 salî de pîrriyaniya zora xwe dabû ser tunekirina zimanê kurdî û heya niha jî dom dike? Ma gelo ew nizanin ku tîkoşîna gelê me, ji bo zimanê wî, çanda wî, muzîka wî, dîroka wî, rizgariya axa wî û nîşanên wî yên neteweyî ne?

Ez ku Kurdekî ji Kurdistana Rojhilat im û bi tirkî nizanin, ezê çawa karibim di gel Kurdekî Bakur ku bi kurdî nîzane, biaxivim?

Ew kesên ku, bi xwe Kurd, jin Kurd, her du jî bi kurdî dizanin, siyaseta (polîtîka) Kurdîtiyê dikin, lê zarokên xwe fêrî tirkî dikin û zimanê wan ji devê wan derdixin. Ma gelo ev ne nezani ye? An jî....?

Heger ez di cihê Tirkan de bim û vî tiştî bibînim, ezê şer dirêj bikim. Ew dibînin ku mirovên Kurd hurmet û nirxa zimanê xwe, çanda xwe nizanin, lê ew aşîqê zimanê bi tirkî ne.

Mirov ji van kesan ku tirkî diaxivin, dipirse:

"Baweriya we bi rizgariya Kurdistanê heye?" Dibêjin erê.

Mirov dipirse:

"Bi dîtina we, Kurdistan dê di çend salan de rizgar bibe?"

Hin dibêjin sê sal, çar sal, pênc sal, pîrriani di bin deh salan de rizgariyê dibînin.

Mirov dipirse:

"Piştî rizgariya Kurdistanê divê gel bi çi zimanî biaxife?"

Dibêjin bi kurdî.

Pîrs: Lê hûn çima di mala xwe de zimanê kurdî dikujin?

Bersiv: Me adet kiriye.

Bi dîtina pîr hevalan ev ne adetkirin e. Ev meseleke psikolojîkî ye, ku zor pîr kûr di ruh û qafên mirovên me de, bi nebaşî cih girtiye. Ev bandûra (tesîra) propaganda dijmin e, ku gelê me yên Bakurê Kurdistanê ji çanda xwe, zimanê xwe û hemû hebûnên xwe yên neteweyî dîr xistiye. Dijmin wisa bi mirovên me daye bawer kirin ku, zimanê kurdî, zimanê mirovên nezan, mirovên nexwenda û zimanê mirovên ku pêşketin bi wan re çênebûye ye. Lê zimanê tirkî, zimanê "medeniyetê" ye. "Tirkek bedelî hemû dinê" ye.

Dijminê bê kok û bê çand hemû pîsî û gemariyên xwe yên ku gelên cihanê ji bo wan dibêjin, ew jî wan ji bo me dixin mal.

Di ferhengoka Alman a bi navê "Duden" de, di bin peyva "Türken" de dinivîse: Türken = ters, şaş (rastî guherîtin), ne zanistî...

"Getürkte Argumente" = gotinên tirkbûyî, gotinên vala, gotinên derew, gotinên bê mentiq...

Ez naxwazim bikevime şovenîstiyê (netewparêziya şaş), lê min dixwest ji bo agahdariya we van tiştên dawiyê binivîsim. Bila gelê Tirk min efû bike.

Pirsî Kesayetî li Kurdistan de

Di van rojan de weşanxaneya Serxwebûn kar û xebatek bi nîrx kir, pirtûka "kesayetî" ji çapê derxist û niha li hemû deveran belav dibe.

Ev pirtûk ji serî ve bi tirkî û di bin navê "Kurdistan'da kişilik sorunu, devrimci militanın özellikleri ve parti yaşamı" derketi bû. Piştî beşên ji vî pirtûkê wergerandine zimanên din. Berî niha bi demekê kin jî, bi erebî çap bûbû.

Wergêr û Nivîskar Mehabat Kurdî nêzî salekê li ser sekinî û pirtûk kir kurdî.

Pirtûk bi xwe ji teref sekreterê PKK'ê yê giştî Abdullah Öcalan ve hatiye nivîsandin û ji şexş beşan pêk tê: Di dîrokê de kesayetî, pîrsa kesayetî li Kurdistanê, taybetiyên mirovên şoreşger û çalak, jiyana partiye û destûra partiye... Pirtûk mîna neynikê (eyne) ye, piştî xwendina wê, her mirovê Kurd dikare kesaniya xwe çêtir binase. Lewma ye ku ev pirtûk gelek caran hatiye çapkirin, ne Kurd tenê, lê gelek xwendevanên welatên din jî sîdên giranbuha ji vî pirtûkê digrin û ew hevalekî pîr baş e.

Mehabat Kurdî nêzî 25 rûpel pêşgotin nivîsandiyê û ew, li ser hêzên reformîst sekiniye. Pirtûk bi tevayî 582 rûpel e û cara yekemîn e ku pirtûk dibe kurdî (diyalektê soranî).

Ji bo vî xebata hêja spasiyek ji bo weşanxaneya Serxwebûn û her wiha ji Mehabat Kurdî re ku pirtûkxaneya Kurdî dewlemendtir kirin.

Gabar Çiyan

ABDULLAH ÖCALAN

THE PERSONALITY QUESTION IN KURDISTAN

THE CHARACTERS OF THE REVOLUTIONARY FIGHTER AND THE PARTY'S LIFE

TRANSLATED AND PREFACED BY MAHABAT KURDI

ISBN: 91-630-086-X

مەهابەت کوردی

پرسی کەسایەتی لە کوردستاندا

تەبەقەبەندی کەسایەتی گەرمەتێری شۆڕەنگێری و ژانی پارێ

ڕۆژگار و پێشکەشی

مەهابەت کوردی

WESANÊN SERXWEBÛN

Koma şehîd Bêrîvanê

Xemê Zaxoyî

Ev kom ji aliyê Beşîr Botanî, Girîna Cizîrî û Sîdarê ve hate damezrandin û bi alîkariya hunermenda Swêdî, Kîkî Oskarsson... Di destpêkê de karê komê tenê, sranên zarokan û çîrok bûn û di Radyoya Dengê Serxwebûnê de dihatin weşandin... Weke Berxo, Baran e, Mala min Kurdistan û heya dûmahiyê... Anku karê komê sî-nordar (mehdûd) bû... Lê di destpêka 1992 an de, karê komê gelekî firehtir bû û pişkên wê jî ev in:

1. Stranên zarokan û çîrokên folklorî
2. Koro
3. Operetên zarokî
4. Destanên folklorî
5. Govendên folklorî de-vera Botan

Niha koma şehîd Bêrîvanê, li Swêdê û derveyî wê bi karê xwe radibe... Ji bo pêşxistina muzîka kurdî, vejandina govend û destanan, Beşîr Botanî gelek xwe westandîye... Lê cihê mixabinê ye ku ji ber

gelek ûştan (sebeban) Girîna Cizîrî ji komê dûr ketiye. Lê canê wê li komê maye û ew bingeha wê ye!

Endamên koma şehîd Bêrîvanê

1. Evîn
2. Mizgîn
3. Sîdar
4. Zêneb
5. Emîne
6. Gulçîn
7. Nêrgiz
8. Leylê
9. Girîna Cizîrî
10. Kîkî Oskarsson
11. Bariş
12. Mehmûd
13. Kerem
14. Boka
15. Ercan
16. Zana
17. Beşîr Botanî

Berhemên (întacên) koma Şehîd Bêrîvanê:

Di pêşerojê de nêzik du kasetên komê dê bêne belavkirin. Naveroka kasetayekemîn stran û çîrok in. Ev kaset bi dengê Sîdar û Beşîr Botanî hatiye tomar kirin. Ercan jî bi wan re pişikdar bû. A duwemîn bi



dengê B. Botanî û Evînê û naveroka wê tenê stran in. Zana di gel wan pişikdar bû.

Nivîskarên stranan jî ev in: B. Botanî, G. Cizîrî,



Beşîr Botanî (li jor), Sîdar (aliyê çepê, li jor), G. Cizîrî (aliyê çepê, li jêr)

Temo û S. Botanî. Di gel vê jî, deh zarokên Swêdî ji bo alîkariyê beşdar bûn. Li dûmahiyê (dawiyê) em hêvîdar in ku berhemên wê komê bigihîne dil, can û

hişê gelî û hemû ji bo serxwebûnê bin...

Lo birano

Lo birano ka Kurdistan Hawar e, ax hawar e
Lo birano ka Kurdistan Dilê me birîndar e

Girê bidin çek û rextan Hawar e, ax hawar e
Girê bidin çek û rextan Dilê me birîndar e

Li ser rêka wan şehîdan Hawar e, ax hawar e
Li ser rêka wan şehîdan Dilê me birîndar e

Helbest: Girîna Cizîrî

Berxo

Berxo tu şîrîn î
Paqij û nermîn î
Ba ba ba

Xweşî ye dîtina te
Hêja ye bêhna te
Ba ba ba

Bixwe giya û tîvil
Û bistire ji dil
Ba ba ba

Ba ba ba baaaa
Ma ma ma maaaa...

Helbest: B. Botanî

Koma Çiya "Rozerîn"

Koma çiya qaseta xwe ya yekemîn bi navê Rozerîn derxist. Koma çiya çalakîyên xwe yê muzîk û çandîyê di bin siya Navenda Çanda Mezopotamya de didomîne.

Kom, ji salkê zêdetir e ku demezirîye.

Em Komê, ji hevpeyvinên ku bi wan re hatine kirinê nas dikin. Çalakîyên muzîk û çandîyê di xizmeta têkoşîna neteweyî de dibînin û her wiha xwe jî di xebatê de mina xizmetkarek gel dijimêrin.

Kom hem bi rêya muzîke dixwaze hestê neteweyî bide gel û pê wan şiyar bike û hem jî dixwaze muzîka Kurdî, li gorî binyad û hîmê wê, rengê hemdemî lê zêde bike. Kom jî nûjenkirina muzîkê nare-ve her wiha di vê xebata

xwe de jî piredengiyê bi kar anîye û hem ji enstrûmanên biyanî di qaseta xwe de lêxistine.

Perçên ku di qasetê de hene hinek ji wan berxwedana gel û girîyên zindanan tîne ziman û hinek ji wan jî gelerî ne. Anku folklorîk û otantik in. Qaset bi awayekî hatiye çêkirin ku hem aligirên muzîka nûjen dikarin lê gohdarî bikin û hem ji aligirên rewşa kevn.

Koma çiya di vê qaseta xwe de gelek xwedî idea ye. Lewre li gorî wan rengê muzîka Kurdî dive ev be. Me gohdarî kir û eciband. Vêca gohdarî kirin dorra we ye bi ecibandin an jî bi rexnekirinê.



KOMA ÇIYA'dan Kürt direniş ezgileri

Berhemeke Navenda Çanda Mezopotamya ye

Bir Mezopotamya Kültür Merkezi Grunodur

Çanda Mezopotamya Kültür Merkezi
M.C. c. Bîrîna No. 8016 - Çandani - Îran
Tel: 527 9481 - 51 850 87

K O M A Ç I Y A

Berxwedana Tendûrekê ya sala 1929 an ne mîna serhildana Şêx Seîd an jî Agiriyê ye. Hin bêtir berxwedanek li hember artêş (ordiya) a neteweya serdest e. Ev hereketa (operasyona) dewletê ya ku ji Osmanîyan maye û derbasî komara Tirk bûye, armanca wê ew e ku pê serê serokên gel û eşîrên serbilind bitewînin. Ji ber vê yekê berxwedana Tendûrekê, bi benameyek (programek) siyasî ku ji aliyê serokatîyek siyasî ve hatiye amadekirin derneketiye holê. Berxwedan, ne xwediyê nêrînek serxwebûnxwaziya neteweyî bû jî, ku gelê Kurd li dor xwe bicivîne. Diviya eşîretiyê xwe li hember dewleta kapîtalîst biparasta. Ew eşîretiya ku heta cihekî bi sedan salan nasnameya Kurd a neteweyî parastibû...

Şêx Ebdilqadirê ku, havînan li çiyayên Kurdistana di bin destê Tirkiyê de û zivistanan jî, li Îranê dima, vê yekê xera kir û li hember êrîşên eskerî ku armanc bindestxistina Kurdan bû, li ber xwe da.

Divê mirov ji vê dest pê bike anku berxwedana Tendûrekê, ji sala 1926 he ta sala 1940 an di çarçoveya berxwedanê neteweyî an jî, bi navê giştî di çarçoveya serhildanên Agirî de binirxîne. Dîsa jî berxwedana Tendûrekê, di nav serhildanên Agiriyê de ya herî bê siyasî, bê plan û bê rêxistin e, lê, li gorî serhildana Şêx Seîd, kakil û rengê neteweyî tî de zêde heye.

Her çi qas damezrawe (muesseye) ya eşîrî zanav û nasnameya gelê Kurd parastibe jî, ev bûne sebebê birakujî û di demên serhildanan de hatine terişandin û bûne alîgirên dewletê. Îro jî, eşîrên li dijî dewletê hene û yên alîgirên dewletê jî hene. Sazûmana cerdevanan, lihevnekirina eşîran, eşîrtî ku ji bo çêbûna hişê neteweyî asteng e, hemû ji bo komara Tirk avantaj in. Ew eşîr û girsên ku Şêx Ebdilqadir xwe pê piştrast dikir, anku eşîra seqa an jî seqan bi eşîrên herêma xwe Keskol û Kotanan re ne xweşî û neyartiya wan he-

Lo rabe wiha nabe!

FAIK BULUT

bû; ji ber gelşa erd, zozan û serokatîyê.

Raporên dewletê, Şêx Ebdilqadir Îranî û mîna ku ji Îranê hatibe Tendûrekê vegirtibe (işxal) didine nasandinê. Ev ne rast e. Lewre ew erdên dibêjin ên Tirk û Îranê ye, li serê Kurd dijîn. Anku ev cografya ya Kurdan e. Parçebûna Kurdistanê ku bi peymanê Qesrê Şêrîn dest pê kiriye û bi Sadabadê hatiye zexmandin, ji aliyê gelê Kurd ve ne meşrû ye. Ji ber vê yekê eşîra Şêx Ebdilqadir, ne tenê ji aliyê mafên gelê Kurd ên meşrû ve, her wiha ji aliyê hiqûqa giştî (kamu) ve jî xwediyê vî xakî bû. Di gel vî qasî, berxwedana Şêx Ebdilqadir, ji aliyê rengê xwe ve neteweyî û ji aliyê çînîti (sinifi) ve jî, têkoşîna erd a gundiyan bû. Jixwe di hîmê mesela neteweyî de gelemşa erd heye.

Komara Tirk, bi wî moralî ku serhildana Şêx Seîd û serhildana Agiriyê ya yekemîn tîk biribû, banî Şêx



Şêx Seîd

Ebdilqadir dike ku teslîm bibe, dev ji mîal û tarişê xwe berde, çekên dest xwe deyne, were Giyadinê (Diyadinê) û ji bo koçberbûna Erzînganê amadekariyên xwe bike. Ev bang, eşkere ye ku tede serî tewandin û tunekirina nasnameya neteweyî heye. Şêx Ebdilqadir vê bangê qebûl nekir. Komara Tirk, bi fermana muftîşê umumiye yê yekemîn bi wate û tîgîha îro, walîtiya giştî, gerîna awarte gefa li Şêx Ebdilqadir dixwe. Şêx Ebdilqadir xerabûna rewşê dibîne û ji bo lihevhatinê kurê xwe yê mezin dişîne Qerekilîsê ba qomandarîtiya tumenê, Lê dewlet bi fên û fend bû.

Jendirme kurê wî digirin. Qomandariya tumenê, dikeve navberê, kurê Şêx Ebdilqadir berdidin. Li ser soz li hev tînin. Lê jendirmên ku wê demê peywiira (wezîfa) îstîxbaratê û tîmên taybetî jî dianînin cih kurê Şêx Ebdilqadir dîsa digirin û lê tahdê dikin. Li ser vê yekê baweriya serokatîya Kurd bi artêşa Tirk namîne. Bextê Romê tune ye. Berxwedan dest pê dike. Makîna dewletê ya pest û pêkutiyê û kuştinê ji dest bi xebatê dike. Carek dewlet îmhakirina Kurdan kiribû serê xwe.

Berxwedana Tendûrekê ya bê plan bê rêxistin û bê siyasî zû ji hev peşkilî (belabû). Eşîrên ku ji hêla dewletê ve hatibûn xapandin li hember birayên xwe çekan kişandin. Her çi qas Komara Tirk, vê serhildanê biçûk dabe xuyan jî, ji bo şikandina wê, ji Qesrê, Aranê (Îxdîrê), Qaqizmanê (Qaxizman), Horasanê, Erzîromê, Erzînganê û ji Erzîromê esker aniyê. Bi rojan

herêma Aledaxê bi topan û balafiran bombe kirin. Tiştê ku balkêş e îro jî navenda berxwedanê Hecî Xelîd, Dutaxa jorîn, gundê Qendîlê ku dikevin navbera herêma Tendûrekê û Aledaxê, navendbûna xwe didomînin.

Ew operasyonên çend roj berê hatin kirin, bi hinceta ji holê rakirina navendên berxwedanê bû. Ji bo valakirina van gundan walîtiya Agiriyê talîmat jî dabû. Dîsa ji bo îmhakirina berxwedana gerîla ya Tendûrekê, ji Îxdîrê, Qesrê, Erzîromê, Erzînganê Erzîcîşê û ji Trabzonê esker tanq, top û hwd. anîn herêmê. Lê ji bo ku berxwedana feodalî cihê xwe dabû berxwedana gerîla, Tendûrek nekete destê hezên Tirk. Komara Tirk xesarek mezin dît. Dersa herî mezin ew e. Feqiyek ku beşdarî serhildanên geliyê Zilan û Tendûrekê nebûbû, piştî qetlîamê ku di nêwalan de, bi sedan term û cendekan dibîne û bi şev xewa wî nayê, dotira rojê radibe vê gotinê dibêje. "Lo rabe wiha nabe." Em nizanin ew Feqî diçe ku û berxwedanek çawa dide, lê ev dirûşma wî, 70 sal bi şûn de be jî, ber bi rastbûnê ve diçe.



EMÎNÊ EVDAL

NÎVÎSKARÊ KURD Î GEWRE

Emînê Evdal bendewariya xwe ji zaroktiyê de bi folklorê Kurdî tîne û di salên xwê yên zankoyî de erka nivîskariyê dike.

Zîna Şikakî

Emînê Evdal di sala 1906 an de, li gundê Emençayîr, li Qersê, li Bakurê Kurdistanê, ji dê û bavekî gundî hatiye dinyayê. Ji ber zordariya Osmanîyan malbata wî dest ji welêt berdide û berê xwe dide Ermenîstanê. Malbata wî, di belengaziyeke reş de dijî, dê û bavê wî herdu di sala 1919 an de dimirin. Emîn, sêwiyê 13 salî, dikeve sêwîgeha Aleksandropolê (Lênînakana îro).

Di sala 1923 an de ango piştî Şoreşa Cotmehê (Oktoberê), Emîn diçe Tiflîsê, paytextê Gurcîstanê, cem apê xwe û li wir dikeve dibistanê. Hema xwendina xwe kuta dike nake, li qeza Aparanê li Ermenîstana Sovyetî, di gundên Kurdan de dibe mamostê zimanê kurdî.

Di sala 1931 an de xwendina xwe ya zankoyî li Zanîngeha Êrîvanê berdewam dike û di sala 1936 an de wê kuta dike. Di ber xwendina xwe re wekî endamekî berpirsiyar di komîta rêdaksiyonê a "Riya Teze" di dixebite. Piştî wê, sala 1944 an, Emînê Evdal sertîfîka Diktoriyê distîne û li Zanîngeha Êrîvanê dibe namzedê zanînen siyâsî û ta dawîya jiyana xwe li wir kar dike.

Emînê Evdal bendewariya xwe ji zaroktiyê de bi folklorê Kurdî tîne û di salên xwê yên zankoyî de erka nivîskariyê dike. Sala 1932 an de weşanên dewletê, helbestên wî bi hinek helbestvanên din re di pirtûka Efrandîna Ewlin de belav dike. Di sala 1935 an, weşanên dewletê pirtûka wî ya yekê ji bo zarokan, Bihar çap dike.

Helbestên wî wergerandine hin zimanên din ên Sovyetî. Wî bi xwe jî, helbest û çîrok ji ermenî kî wergerandine kurdî weke helbesta "Lênî û Elî", "Egîşê Çapîns", pirtûkên H. Tonmanian û yên AV. Isahakian û çîrokên G. Hovnan.

Di sala 1936 an de weşanên dewletê pirtûka wî û ya folklorîstê Kurd, Heciyê Cindî, bi sernivîsa Folklorê Kurmancan (1), 663 rûpel, belav dike. Ev pirtûk bûye ku gava Qazî Mihemedê nemir li Mehabadê girtibû destê xwe, bilind kiribû û gotibû: "Aha, ev e Qurana me". Emînê Evdal helbesta Kurdî Mem û Zînê, careka din dinivîsîne û di sala 1958 an de weşanên Haypethart li Rewanê wê çap dike.

Emînê Evdal xwe ji bo çapkirina pirtûkê şagirtên Kurd diwestîne û pîr lêkolînan jî çê dike, wekî Kulfeta Kurd mala Patriarkalda, Êtnografîya Kurda, Erfedetê Kurdê Pişkavkazê, û hwd. Li hêla dinê jî, E. Evdal nivîsar û lêkolînan li ser zimên çê dike. Kurdnasê navdar, Bazîl Nikîtin namekê ji Celadet Bedirxan re bi Fransîzî dinivîsîne, tê de mirov rola E. Evdal a zimannasî dinase:

"Anegorî agahdariyên ku di kovara Ermenî, Massis bi zimanê îngilîzî (çiriya paşinberçile 1933) de belav bûne, rêxistinên zanistî yên Yekîtiya Sovyetê bi taybetî yên Komara Federal a



Emînê Evdal

Pişkavkaz, xebateke fit a fireh dike da ku gelê Kurd li ser bîngehekî neteweyî bîne ser hev. Li çileyê çûnî (çûyî) Konferansê li Tiflîsê hate pê û xebatên ku hatibûn kirin li ser rawestî. Amûjgeha (Enstitû) Gelan a ku girêdayî Komîta Navendî ya eksêkyûrtîf a Mosko komîsyonek şande Pişkavkazê da ku li rêxistina herêmên Kurdî li Azerbaycanê, li Ermenîstanê û li Gurcîstanê, binere. Komîsyon ji Profesör Şemîlov (Erebê Şemo Z. Şikakî), Kurdê navdar, Profesor Miller, jurîstek û M. BîrYûxan, Aşoriyek, hatibû pê. Li navçên Axbaranê û Talînê li Ermenîstanê, komîsyonê hemû gerekiyên zimanasî ji bo zimanekî kurdî ê wêjeyî yê yekhev amade kirine... Zaravnasîna Kurd, Betoyan, Emînê Evdal, Heciyê Cindî û Çerdoyê Gêncê bêtirî sê salan kar kirine, têgîn, gotin û hevokên Kurdî kom kirine da ku zimanekî yekhev û hêsan çê bikin."

Emîn xwe ji layê xwendevanên Ermenî de dide nas kirin. Sala 1957 an, pirtûka Hkyatê Cima'eta Kurda û Bhara Ewlin bi zimanê Ermenî belav dike.

Di sala 1963 an, Weşanên dewletê pirtûka wî Şiêran û Poêman çap dike. Sala 1964 an, piştî mirina wî û di sala 1974 an de, Weşanên Hayastan li Ermenîstanê herdu helbestên dirêj ên destanî, "Xelîl û Sînem" û "Perîşan", di pirtûka bi sernivîsa Perîşan de çap dikin.


Yek ji baştirîn pirtûkên wî ev pirtûka etnografî ye: Heleqetîd pismamtî nav Kurdada. Di sala 1965 an de, Weşanên Akedemiya Nank a Ermenîstana Sovyetê wê pirtûkê çap dike. Ev pirtûka lêkolîneke etnografî ye, bi Kurdî, Abêya Sîrîlik, hatiye nivîsandin. Mirov dikare beje ku lêkolînen bi kurdî jî vî rengî pêçiyên destekî derbas nakin. Hêja ye ku ev berhem careke din were çap kirin.

Emînê Evdal yek ji nîşê pêşin e ji Kurdên Sovyetîstanê.

1. Tîpa (ç) di abêya pêşin a Kurdên Sovyetîstanê de di abêya Hawarê de (c) tê lêv kirin.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Keftorê çilvir

Keftorê çilvir, dodikê genî
Mîna gurê dir, we Şirnex jenî
Qaşo musulman, birayê we bûn
Bê dîn û îman, hûn qeyê hebûn
We d'go em yek in, Kurd birê me ne
Bes vira nekin, ev kirê we ne
Bi dev musulman, bi dil kafir in
Bê ehd û peyman, karê we vir in
Gurê pişt hêşîn, hene xwînxwar in
Bi gîr û bi kîn, hov û barbar in
Dijmin in, dijmin, gur nabin merî
Ku l' Şirnexa min, ketin nav kerî
Ne Sîrp û Bulxar, ne jî gura kir
Wî rewşa xwînxwar, we ku l' wîra kir
Gurê xwînxwarê, serleşkerê we
Hov û barbarê, ku qeşmerê we
Panokên teres, caşên bê namûs
Çikandin nefes, bûn elk û kabûs
Wek hov û hara, ketin Şirnexê
Top û teyara, xwe dan wî rexê
We dan ber gulla, We d'go pekeke
We digo gerîla, kirin ew leke
Bê şerm û fedî, bê şerm û ar in
Gurê bê kedî, hov û barbar in
Sî milyon Kurd in, ew hemî namrin
Hûn çiqas qirdin, ewqas hev digrin
Dê bivin leşker, ew hemû weke
Gelên şoreşger, tev bin pekeke
Dunya bi dor e, keys û fesal e
Geh zilm û zor e, geh mor û al e
Îro dora we, sibê ya wan e
Zilm û zora we, bê fayde mane
Seddâmê qeşmer, we dî çî kîn kir
Paşê çer bû ker, tersê xwe bîn kir
Çiqas bikujin, hûn Kurdan qirkin
Çiqas bimijin, xuna wan firkin
Dê ewqas geş be, şerê azadî
Dijmin bê weş be, bimre bê dadî
Êdî gelê Kurd, nabin kolê we
Çend caşê zugurd, bûne tolê we
Bi wan nexapin, ew ne yê we ne
Bi dest we kap in, ew caşê me ne
Dema fersendê, dê ew bizîqin
Werin govendê, de dest de fiqin
We l' ber çavan dî, cahşê İraqê
Dema fersendê, hatî tifaqê
Ziktirşê keçel, divê hûn fêman kin
Dodikê çepel, virê xwe kêman kin
Çare heqnasî heye, wekhevî
Demokirasî, fam kin win evî
Nebin pêkenî, nebin hov û har
Nebin rûtenî, bivin dost û yar
Dunya bû cenet, Cizîr û Şirnex
Gurê mixenet, we kir wek dozex
Agir we geş kir, ku bû şewate
Rûyê xwe reşkir, ev çî xebat e
Hûn bi vî qûşê, nagijin Mûşê
Bi vî nemûşê, dişkênin şûşê
Hûn qeyê dîn in, yan bê îdraq in
Hûn xwe d'xapînin, naşîn me rakin
Riya aşîti, li ber me digrin
Nakin başîti, dê tevde bimrin

Dewleti, Kurdistan di mekanîzma kîştîşî, rijnayîşî û veşnayîşî ya

J. Epar

Kurdî, heşt serrî yo ki semedê xelaseyda welatê xwi tîng dest di ceng dir î. Nê heşt serran miyan di cengê azadî roj bi roj aver şî û heme heway ra bi malê şarî. Meselay Kurdan Tirkiya di bî mesela tewr xişn. Ewro hem Kurdistan di û hem zî Tirkiya di herkes hîni na persi ser o vindeno, na persi mu-naqeşa keno na persi pej-miryêno. (duşmişêno)

Bêguman giregirê Dewleti û generalê Tirkan hema ra zî bawer kenî ki na mesela bi zulum û zor reyra hal bona. Îlehîm zî generalî Tirkan hema ra zî bawer kenî ki do yê cengê Kurdan ebi sîleh, ebi jenosîdan û gonîwewerî wertew re hewenî. Ehendey lej ra pey Serekê Ordidê Tirkan general Doğan Gureş vano ki "Tirkiya di persay Kurdan çini ya, yanî Kurd çini yî." (Bewnê Milliyet 05.09.1992)

Yeno ma virî çaxo ki PKK 1984 di dest bi nê cengî kerd, Dewleta Tirkan vatîni: "Çend hebî terorîstî hamey eyşto qereqolandê ma ser û şî. Ma do kokê înan çend rojandê biyarî." No propaganday xwi serrê di serrî kerd, labelê ewniyay hedîsey hergû roj hina vêşî benî. Na

ray dest pê kerd sistemê pawitoxanê dewan (koy koruyuculugu) saz kerd. Ebi nê sistemî waşt ki Kurdan bi Kurdan bido kîştîş û xwi nê girwiy ra durî fi-na.

Labelê hesabê Dewleti rast nêvejiya. Pawitoxê dewan dardê Dewletê Tirkan rî nêbî derman, gerillayan şarê reydi têkiliyê xwi geş kerdî û bi hêviyey Kurdan.

Ebi inhewa yewna deme viyart. Labelê Dewleti adey xwira nêamey-war û tedbirê eskerî hina vêşî kerdî. Û na ray Kurdistan di yew Îdarewo Xusûsî rona û bi komandoyan, bi timanê xususiyay waşt ki adirê azadî bitefêno. Çunkî Dewleti rojo rojên ra problemê Kurdan tim û tim sungî reyra hel kerdbi. Cûka zî zulm ra, te'ada û kîştîş ra vêşêr çirray çî nêameynî Dewleti virî. Politîkay Dewleti, Herbdê Şex Seîdê di, Terteley Dêrsîm di û Agirî, Zilan di çibi nika zî aya ya. Labelê nika nîş-na çend aşm ya zî rojan di serehewenayîşê Kurdan wêrte ra hewena. Aw samed ra hergû roj hina vêşî har bona.


Na harey Dewleti nê di hirê serranê peyenan di hina vêşî eşkera bî: Dewleti bi des hinzarayan reyra Kurdî bille sebeb eyştî zîndananan. Bi name bê operas-

yonan, hergû roj eyşt dewan, qezan û şaristanan ser. Cenî û camêrd, kal û pîr bi name bê terorîstey kîştî. Mal û milkê şarî talan kerd. Şar surgun kerd, dewî veşnay û bi rojan duy adirî koyandê ma ser a kemî nêbî. Terş û dewarê şarî telef kerd. Tayn cayan di nan û werê şarî bima. Şaney û gawanê kîştî.

Dewleti Newrozê 1990 di dest bi qatliamanê sivîlan kerd. Nisêbîn di, Cizîr di Kurdê ki wayirê cenazandê gerillayan vejiyaynî kîştî. Dewleti hîni Dewletey ra vejiyaybî. Dewleti bibî gangaster.

1990 ra pey Dewleti, Kurdistan di bî illegal. Dewleti kontrgerîla newe re organîze kerd û kewt pey welatperweranê sivîlan zey Wedat Aydinî, zey Sıdıq Tanî û ay binan. Kîştîşê Wedatê rehmetî ra pey kontrgerîla bi name bê Hizbulah dest bi cinayetane politîkan kerd. Û gelek roşenbîr û welatperwerê erjiyayey kîştî. Nika zî dest bide kerdo şaristanan bi tank, top û teyaran rijnena.

Eşkera aseno ki Dewleta Tirkan nê heşt serran roj bi roj zulum vêşî kerdo. Dewleti biya mekanîzma xirabkerdîşî, Dewleti biya mekanîzma rijnayîşî, kîştîşî û veşnayîşî. Kurdistan di, Timê xusûsî, kontrgerîla, hîz-



bulkontra, komandoy, tankê leoparî, helikopterê kobra û apaçî Dewletey Tirkan temsil kenî. Beyntardê Kurdan û Dewleti di bindi têkilî nêmendî. Qetliamê Şirnaqî di têkilî Dewleti û Kurdan rind beylu bî. Şirnaqî di ayê ki Dewleti reyra yî çend ke-yeyê xayîn I Dewleti zulum çendeyî vêşî kerdo, Kurdî zî ehendey jay ra durî kewtî. Kurdî ehendey biyî neyarê jay. Hîni herkes zano (generalan ra teber) zulum çendeyî vêşî bo Dewleti ehendeyî vinî kena.

Ez vana qey ganî hîni generalê Tirkan zî bizanî, zulum û zordarey tim û tim pere nêkeno. Ay wextû Delu Fikrî viyarto. Ay Kurdê ki Delu Fikrî ra tersaynî, Kurdê bê organîzasyon û bê Partî bî. Ay Kurdî bê serek û bê gerilla bî. Ay çax şar nezan bi û vatey yîni yew nêbi. Hewna ay Kurdê ki Dewleti bi teyaran, top û tankanê xwi, bi

weşîyey û bêbabeyda xwi tersaynî Kurdê 1920-30 bî. Nika ma ver bi serrandê 2000 ra şanî. No beyntar di 60-70 serrî viyartî. Kurdî nê beyntar di biney nor û dorey xwi ewniyay, kemane û nezaney xwi diya. Şaşeya ki bawkanê yîni kerda yê nêwazenî hewna bikî. Yanî Kurdî Kurdê 1920-30 niyî.

Labelê Dewleti hema ra zî Dewletey 1920 a. Dewleti hema ra zî Dewletey Kemalîstan û generalan a. Beyntardê Dewleti û Kurdan di 60-70 serrî ferq esto. Kurdî 60-70 serrî verniya Dewleti dir î. Xwira problemê Kurdan û ey na Dewleti zî no yo. Dewleti wazena Kurdan bika zey verî. Yanî Kurdan 60-70 serrî tepa bera. Labelê Dewleti zaf erey menda. Na se'et ra pey Kurdî hîni yew gam zî tepa nêerzenî, tenya yew gam zî! Wa inay herkes bizano!

Bersiva xaçepirsa bi xelat

Çeperast: 1-Heciye Cindî 2-Usa / Adan / Ena 3-Nine / İr / Dr 4-Erase / Çepel 5-Ne / Agiri 6-Ka / Mer 7- Org / Bira 8-Merwanî 9-Neal / La 10-Çavnebar
Serejêr: 1-Hunerkom 2-Esir / Arena 3-Canan / Grev 4-Esef / Wan 5-Ya / Bale 6-Edi / Amin 7-Car / Gerila 8-In / Cira / Ar 9-Der 10-Derpi 11-In 12-Aile

XAÇEPİRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Helbesvan û wergêrê Kurd. Di sala 1945 an de, li Kurdistana Başûr, li bajare Hewlêrê ji dayîka xwe dibe. Wi dibistana sere-tayî, li Hewlêrê xwend û li wir bû mamoste. Dawî, li Sowyetê li ser edebiyata Kurdî dixwîne. Niha li Libya dijî. Çend pirtûkên wî yên bi nav û deng ev in: Firisk û Zam, Bitî Şikaw, Şewnamey saîrekî tinû, Şew niye xewintan pêwe nebinim, 12 wane bo mendalan û çend pirtûkên wergêrê. Helbestvan helbestên xwe bi zaravê sorranî dinivise. Di wênê de tê ditin. 2-Qoq, qaf/ Bi ser û ber/Welidî 3-Muxbir, cesûs/ Bi ermenkî, navekî mêran 4-Bajarek li Amerika/ Hestûyê masiyan 5-Dema tê pêşiya peyvê, wê dike herî mezin, herî pîrr/ Sembola Samarîûm/ Timî, hergavî 6-Qibla musulmanan 7- Nasandin 8-Edalet/ Zengil 9-Hicûm/ Tav 10-Carîsî. toqa ku bi şeytan ve hat/ Semola Nîkelê

Serejêr: 1-Dilî/ Mê, mak 2-Ji nû ve bi jiyانبûn/ Li Mezopotamya navê împaratorekî, Daryûs 3-Pere/ Cihê li ka tê veşartin 4- Navê mehek/ Pê por tê rastkirin 5- Kinnivîsîna Lître/ Mîsal, minak, wekok 6-Di listikên Shakespeare de navê qralek şanogeriyê/ Dil 7- Bi crebî pîrrhejmariya 'Kurd'/ Navê mehek 8- Yezdanê ji kevir/ Weşanek radyoyê li Rojnîlata Almanya/ Daçekek 9-Navê dînek, ku ji

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												



zerdeştîyê tê 10-Nav, deng 11-Cinavka kesane yekemin/ Sembola Sîlisyûmê 12-Birêvebirê bajaran
BERSIVA XAÇEPİRSA HEFTIYA ÇUYİ
Çeperast: 1-Nadoyê Xudo 2-Alikar/ Sedem 3-Vin/ Siyabend 4-Afişe/ As 5-Romen/ Ziraet 6-Olû/ Adn 7- Katot 8-Besna 9-Deve 10-Xwar/ Rio
Serejêr: 1-Naverok/ Ax 2-Âlî/ Olan 3-Dînamît/ Da 4-Ok/ Fe/ Ober 5-Yasin/ Tev 6-Êrîş/ Ser 7-Yezdan 8-Usa/ In/ Aso 9-Debar 10-Odesa 11-En 12- İmdat

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkiyê û li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopye-ke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad.

Atay Apt. No:5 Kat:1 D:4 Çağaloğlu / İstanbul

Tel: 511 57 60 - 511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Ez çûbûm gundekî Şerefa Sewqan, navçeya Elbanê (Başqale.) Gund tev ceşş bûn. Ez bûm mêvanê malekê û xweyê malê jî ceşş bû. Silehên ceşşên wî gundî tev keleşkof bûn. Li xwe ne digirtin G3 an destê xwe bigrin.

Cînarên wê mala ez lê mêvan bûm, hati-bûn û em bi hev re rûniştibûn. Me behsa dinyayê dikir. Wê çaxê me dît xortek deriyê xanî vekir û silavê da me. Di wê civatê de tu kes bersiva wî neda û lê kirin qêrîn û gotin derkeve seyê pîs!.. Piştî wî ez pîrîr şewilim (mahçûp bûm)..

Min got wan, gelo ev çi hal e?

Wan jî bersiva min dan û gotin "Xort, di mala xwe de xizan e, nikare bo xwe silehek bikire. Me jî navê ango, di gel tîfinga dijminî were nav civatê. Çavê me li G3 ê rana-be (Em li xwe nagirin G3 ê destê xwe bigrin)

Min got: "Her wisa?"

Rovî û dîk

Salih Goyi / Gundê Rapîn / Şirnex



Wan got: "Wiha ye."

Min got: Destûra we hebe ezê ji we re serpehatiyek rovî û dîkek pêşkêş bikim. Wan jî got Kerem bike!

"Rojek rovî hate rexê gundekî û dîkek rastî wî hat. Gava çavê dîk bi rovî ket, tirsîya û baz da. Rovî gazî dîk kir. Got: "Ho apê dîk çima direvî? Ez hatime pîrsek ji te bikim."

Dîk sekînî, got: Ke-

rem bike. Birazî daxwaza te çi ye?

Rovî ji dîk re got: Ez û torî (çakal) me şert girtiye, torî dibêje wextê ku dîk bang dide çavên xwe dineqîne (yummak) û wisa bang dide. Min jî, bawer nekir û min got ne wisa ye. Ez hatim ku ji te bipîrsim.

Dîk got: Wele ji min re ferq tune ye.

Rovî got: Ez bawer nakim, tuyê çawa çavneqandî bang bi-

dî?

Dîk got: Ka guhdariya min bike, a niha ezê çavê xwe bineqînim û bang bidim. Rovî karê xwe kir.

Dîk çavê xwe girt û got: Uuuu... Rovî xwe lê da û tehn (boğaz) girt. Dîk got: Tuyê çi ji min bikî.

Rovî got: Wele ezê te bixwim...

Dîk got: Te her ez girtim bi xayinî, ez xayinî bi te nakim, lê ez tiştêk ji te dixwazim.

Rovî got: Çi ye?

Dîk got: Eger tu min bibî berjor, gundî wê te bibînin û dê te bikujin. Belê min berjêr bibe nava bexçe hinek zarokên gundiyan li nava bexçe hene. Ew dengê xwe ji te re dernaxin, tuyê ji wan re bêjî wî dîkî, min ji gundekî din aniye.

Rovî qebûl kir û berê xwe da berjêr nava bexçe. Zarokên gund roviyê kîmed (fihlbaz) li nava bexçe dîtin û li dorê civiyan, lê kirin qêrîn û gotin: Ev çi ye di devê te de?

Rovî jî got: Wele... devê rovî ji hev vebû û dîk ji devê wî baz da, got pîrîr çû ser darekî.

Rovî jî berê xwe hevraz kir.

Got: Qeda li wî bikeve ewê cihê xebardana xwe nebîne û xeber bîde.

Dîk, ji wî re got:

Belê tu mafdar (heqdar) î.

Lê, qeda li wî bikeve ewê ku li ber dijminê xwe çavê xwe digire.

Şivanê derewîn

Hebû ne bû, şivane-kî derewîn hebû... Rojekê ji rojan wî li mêrgê hawar kir.

Şivan: Gelî hevalan! Werne alîkariyê! Gur hatiye pezên min...

Hevalên wî hatin û dîtin ku derew e...

Heval: Çi şivanekî derewîn e!

Şivan: Ez henekan dikim lo!

Rojekê Şivên dixwest

pezên xwe biçêrîne, gurekî mezin hate pezên wî û di cih de wî hawar kir.

Şivan: Werne alî min! Gur hatiye!

Heval: Derewan dike em naçin lo!

Hevalên wî, ji wî bawer nekirin heya gurî çend pezên wî xwarin. Ser wê carê de şivên (Şivanî) soz da ku nema derewan bike...

Şivan: Ji îro û pê ve ez nema derewan bikim!

Hevalên wî: Piştî çî? Te mala xwe bi destê xwe wêran kiriye!

Beşîr Botanî

Sibe xwedî dewlet im

Milletek qareman im
Hember zora zeman im
Ji bîr nakim doza xwe
Qet naşkênim soza xwe
Şer dikim bê rawestan
Nizanim çi ye westan
Şer dikim, şer naxwazim
welatê xwe dixwazim
Niştê min e dêrîne
Ber dilê min şêrîne
Gerçî îro bindest im
Sibe ez jî serbest im
Hebûm dereng hatime
Hişyar û kêrhatîme
ji mêj ve ez millet im
Sibe xwedî dewlet im
Xebata min zanist e
Dijminê min faşist e
Ji xavi yê hez nakim
Xebata xwe bes nakim
Her tiştê min bi kurdî
Li bajêr û li gundî
Azadî xelatê min
Kurdistan welatê min
Hingê dîsan dirist im
Kurdîm haştîperist im

Sebrî Botanî



Dr. Ebdilqadî Ehmed li ser rewşa Kurdên Başûr disekine û dibêje:

'Xelk dixwaze azadiyê biparêze, lê serokatî?'

Kek Ebdilqadî, tu ji kerema xwe re dikarî ji xwendevanên me re behsa seredana xwe ya Başûr bikî?

-Ez 40 rojan li Kurdistanê mam. Sebebê çuyina min a Kurdistanê seredan bû. Ji bilî seredanê ez li ser hin projeyan jî xebitîm.

Ji karên min yek ew bû ku em li ser rewşa nefsi, tendurustî û sosyal a zarokên bê dê û bav rawestiyên. Ji ber ku, ev grûba zarokan di nav civaka Kurdan de gelek zêde bûne. Tradîsyona pîroz, ku di nav civata Kurdan de hebû wekî xelkê bi dixweşî xwe-đîtiya zarokên sêwî, ji yê xwe çêtir dikirin, gelek mixabin sist û seqet bûye.

Niha di şûna vê tradîsyona xumalî de, sistema avakirina **Xaniyên Zarokan** peyda bûye û cihê xwe dike ku çavnerînek zanistî hebe: Ji ber ku em bizanibin, ji van herdu sisteman kîjan ji bo civaka Kurdan baştir e, me dest bi xebatekî kir. Min rewşa tendurustî û nefsi ya 30 zarokên ku xelkê xwedî dikirin pîvan, li gel zarokên ku li Xaniyên Zarokan hatine wergirtin. Hem piştî 6 meh û hem jî piştî salekî emê rewşa herdu grûban seh bikin, bizanibin ka rewşa kîjan ji wan baştir e.


Karê min ê duyemîn jî, çêkirina merkezek tendurustî ji bo zarokên ku xwediyê problemên psikolojîkî ne. Me li Dihokê û Hewlêrê ji wan re bi navê Hawar projeyekê daniye. Ji aliyên din ve me sala berê hin zarok parastibûn. Me ew zarok di nav dîtin û rewşa wan jî çav bihurand û her wekî sala par em dê rewşa wan di kovar û konferansên cihanî de belav bikin.

Ji aliyê tendurustî ve rewşa Başûrê Kurdistanê çawa ye?

-Heger mirov rewşa Kurdistanê ji aliyê tendurustî ve, bi sala par ve muqayese bike, rewşa niha gelek çêtir e. Niha derman û tiştên tibbî ji par zêdetir in. Nexweşxane pêşketir, doktor jî baştir organizekirî ne. Komela bijîşkên (doktorên) Kurdistanê çêbûye. Ev organizasyon bi tu partiyeke siyasî ve girêdayî nîne. Lê belê, di xebatên karê tendurustî de hinek tiştên ne zelal jî hene. Ev ne zelalî jî, ev e, ku xebatkarên vê qadê nikarin serpirîştîya (îdare) xwe bi xwe bikin.

Qada tendurustî, heta wexta ez hatim jî girêdayê hikûmeta merkezî yanî hikûmeta Iraqê bû. Meaşê doktoran, xwarin û vexwarina nexweşxanê, demanê nexweşxanê girêdayê hikûmeta Iraqê bû.

Kek doktor, tu dibêji hê jî qada tendurustî ji %60-70 girêdayê Bexdayê ye. Baş e, ji bo çî



Dr. Ebdilqadî Ehmed kî ye?

Dr. Ebdilqadî Ehmed li Universita Mûsilê fakulta tîbbê qedandiyê. Niha li Swêdê dijî û li ser nexweşînan zarokan îxtîsas dike. Dr. Ebdilqadî avakirê (danevên) Komela Bijîşkên (Doktorên) Kurdistanê li Swêdê ye. Wî jî bo berjewendiyên Kurd û Kurdistanê têkilî bi organîzasyonên tendurustî û mirovayeti re (wekî Xaça Sor, Rêxistina Parastina Zarokan û hwd) daniye.

Ew di sala 1988 an de, bi rewşa penaberên (muhacirên) Kurdên Başûr li Tirkîyê ve mijûl bû û rewşa wan bi raporekî, bi zimanê îngilîzî, pêşkêş kir. Ev rapor paşê, ji aliyê Cepha Kurdistanê Iraqê ve hat wergerandin ji bo Erebi.

Dema felaketa "Reva Mezin" Başûrê Kurdistanê (1991), Dr. Ebdilqadî bi organîzasyonên alîkarî yên Swêdê re çû hawara hemwelatîyên xwe. Ew, sê car çû, ciyên felaketê û hat. Her sê caran jî, ew li ser rewşa zarokan sekînî. Wî lêkolînên xwe li Konferansa Navneteweyî ku di payîza 1991 an de bi navê "Saxlemî, Eziyeta Siyasî û Mafên Mirovan" li paytexta Şîlî, Santiagoyê pêşkêş kir û di pirtûk û kovarên tendurustî de belav kir.

têkilî bi Bexdayê re hene? Çima Kurd bi xwe serokatîya van dezgehên nakin?

-Çaxa ku mirov vê pîrsê jî xebatkarên Universita Selaheddîn, doktorên nexweşxana Hewlêr dike, bersiva wan wiha ye: Bira, em nikarin ji aliyê aborî (ekonomî) ve îdara xwe bikin. Îcar çaxa ku tu li gel partiyên diaxifî ew tişteki din dibêjin. Mesela PDK-Iraqê dibêje, em wiha dikin ku sibê Hikûmeta Merkezî bikaribe dewrê xwe bitîne. Ji ber ku em li gel hikûmeta merkezî ne, Seddam ne baş e. Ji bo wê jî divê tîkiliyên me bi hikûmetê re hebin.

Ji bo pêşerojê hêviyê xelkê çî ne? Ji bo meclîsê çî difikirin?

-Xelk jî hemû aliyên ve xerîkê (mijûlê) avakirinê ye. Bi rihekî nîştimanperwerî bi rihekî Kurdîyê xelk xebat dike. Ji doktoran bigre heta muhendîsan, ji gundiyan bigre heta paqijvanê belediyan herkes xebat dike ku ev azadiya heye biparêze û ji bo serxwebûnê bike bingeh.

Gera min ne bi perspektîfê siyasî bû. Ji ber wî jî, tehlîlê siyasî ku ez bikim mumkun e şaş bin. Lewma jî, ez hez dikim tiştên ku

min bi çavên xwe dîtiye bêm.

Min gelek endamên parlamentoyê wezîrê tendurustî û wezîrê kar û barê ragihandinê dit û min gelek hevalên doktor jî ditin. Tiştên ku min fam kiriyê ev e: Wekî ku tê zanîn PDK-I û YNK li parlamentoyê di giranî de ne. Çaxa ku mirov li gel parlementerê PDK-I diaxife ji bo parlamentoyê wiha dibêjin: Çi li hundirê parlamentoyê û çî li derê parlamentoyê pêgava ku em davêjin ne li dijî qanûnên Iraqê ye. Em dixwazin herêma Kurdistanê, li gel Iraqê bimîne.

Çaxa ku mirov li gel hevalên YNK diaxive, tiştên cihê dibêjin: Me esasekî daniye, parlamentoya xwe çêkirîye. Encumena Wezîran çêkirîye. Em esasekî dewleteke Kurdî datînin. Em hikûmeteke serbixwe ava dikin.

Lê çaxa ku mirov jî xelkê dipirse û dibêje: "Hûn dê zivistanê çî bikin? Hûn dê li vir bimînin an na?" Kes nizane ka wê sibê çî bike. Ew giş, li benda rewşa siyasî ne. Tişteki ronî û zelal nîne. Tiştê herî ne xweş jî ev yek e. Tu programmekî jî bo parastina azadiya îro tune ye. Lewma jî xelk ditirse, ji ber ku Seddam her li ciyê xwe ye.

Seddam her bi quwet e. Cihazên tendurustî û gelek cihazên din hê jî girêdayê Bexdadê ye. Bi wan cihazan Seddam destê xwe kiriyê nava Kurdistanê û tehrîbatan jî dike.

Nerehetiyekî heye li Kurdistanê, ewletî kêm e. Mirov li Suleymaniyê nerehetiyê hîs dike. Xelk jî xwe ditirse, xelk ditirse ku bê kuştin. Xelk ditirse ku tiştên wî bîn dizî. Dizî zehf e. Li Hewlêrê dîsan xelk jî xwe ditirse, dizî zor (pîr) e. Kuştin heye. Lê, dîsan jî, ji Suleymaniyê baştir e. Were Dihokê, rehetî heye. Ewletî heye, dizî kêm e. Tertîba nava bajêr, ji paqijiyê bigre hetanî trafikê, ji Suleymaniyê gelek baştir e.

Ji bo çî nerehetî, bê ewletî û dizî li Suleymaniyê zêdetir e? Li Dihokê çima rewş baştir e?

-Li ser vê yekê ez dîtina xwe dibêjim. Ji mêj ve ye xelkê Suleymaniyê radikal e. Xelkek şoreşger e. Ev xelk li ser xwe tişteki qebûl nake. Lê, xelkê Dihokê xelkekî konservatîv e. Xelkekî tirsîyayî û rehet e. Tu çî şikil bidîyê qebûl dike. Guherîna naxwaze. Li Kurdistanê Iraqê otoîte tune ye. Konservatîzm tiştan nagere, rehet e, bes bi jiyana xwe ya rojane ve mi-

jûl e. Bajare xwe paqij dike, xwarin jî bo eyalên xwe peyda dike. Lê, rewş li Suleymaniyê li dijî vê yekê ye. Heryek jî aliyekî ve dixşîne. Tevger û dinamîzmeke xurt heye. Dixwaze tiştan biguherîne. Bi bawerîya min heger guherîn li Başûr hebe, wê jî Suleymaniyê dest pê bike.

Gelo haya gelê Başûr ji tîkiliyên Telabanî, Berzanî û Tirkîyê heye an na?

-Qurban, haya gel jî beyanên Mesûd Berzanî, Celal Telabanî û mesûlên wan ên din heye. Û xelk jî, pîrs dike. Axaftinên van serokan jî gelek caran hevdu nagirin. Carna dibêjin em Iraqî ne, carna dibêjin em konfederasyonê li gel Tirkîyê çêdikin. Carna dibêjin, em li gel Iraqê dikin. Xelk jî çûndin û hatina wan a Tirkîyê agahdar e û ji wan peywendîyan ditirse.

Demokrasiyek heye. Lê ev demokrasi tenê ji bo Kurdên Iraqê ye an jî, ji bo Kurdên ku li derê PKK'ê ne. Cepha Kurdistanê îttîfaq kiriyê ku PKK, li Kurdistanê Başûr tevgerêki qedexe ye. Ew partiyan ku alîkariya PKK'ê dikin ew jî qedexe ne. Heta ez hatim jî hin insanên ku di nav wan partiyan siyasî de wek PAK (Partiya Azadiya Kurdistanê) di zîndanên Cepha Kurdistanê de hebûn. Ji ber ku alîkarî, tanzîmkirin û propaganda PKK'ê qedexe ye mirov jî wan dipirse û dibêje: "Baş e, ev çî demokratî ye? PKK'yî jî Kurd in, şer dikin, şoreşa wan pêş dikeve, xizmet dikin. Ew dibêjin: "Em nikarin, ji ber ku rîya me li ser Tirkîyê ye. Ji bo hatin û çûndinê em mecbûr in PKK'ê qedexe bikin."

Rêxistînekî Kurdistanê Iraqê heye navê wê Têkoşîn e. Min bi hevalên Têkoşîn re qise kir. Ew jî alîgirên PKK'ê ne. Wan digot: "Me bi YNK'ê re îttîfaq kiribû jî bo hîlbijartinan. Wê du hevalên me lista YNK de bibûna parlementer. Çaxa ku liste eşkere bûn navê hevalên me tede tune bû. Me ji wan pîrsî, bersiva me wiha dan: "Na bira em nikarin. Dewleta Tirkîyê, Hulafa (Hêzên Hevkar) û PDK-I ji me xwest ku, divê tu alîgirê PKK'ê li parlamentoyê nebe. Ji bo wî jî, me navê hevalên we nivîsand."

Belê, ji ber wan bûyeran û ji ber nebûna stratejiyekî rast û xweristî li cem serokatîya Cepha Kurdistanê, mirov ditirse ku ev azadiya niha li Kurdistanê Başûr bibe wek "dîwarê li ser berfê." Ew jî bibe wekî Komera Mahabatê û hilwaze. Lê mîlet hişyar e, xwedî tecrûbe ye. Mîlet ne amade ye şerê birkujiyê bike. Em hevîdar in, ku gelê me xwe jî fêl û dafikên dijminan xelas bike!

welat

• Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır
• Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul • Tel:511 57 60 - 511 66 02
• Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
• Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France
• Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ